



'Qey ez ne jin im?'

Heta niha tevgerên jinan ên civaka serwer çî li Amerîkayê, çî li Kurdistanê, çî li Ewropayê û çî li deverên din bin, kategoriyên heyi ji hev cuda û wek pirsgrêkek xwerû digirin dest. Ev jî qet nebûye bersiv... **Sozdar Koçer / R.2**



Dengê zarava û wêjeya kurdî

Li navenda Almanyayê, li Berlînê pirtûkfiroşekî kurd heye û pirtûkên bi hemû zaravayên kurdî li Al-manya û seranserî Ewropayê belav dike. Navê pirtûkxaneyê Kitêbhên e û pirtûkên kurdî ji bo xwînerên xwe yên li Ewropayê dabîn dike... **R.11**



Dengekî ebedî û herheyî ye

Dengbêjê nemir Museyîb Gulşenzade yek ji dengbêjên bi-navûdeng yê herêma Makûyê ye. Museyîb hê zarok bûye ji ber ku carekê li dibistanê stran gotiye, mamoste lê daye û wî jî dibistan terk kiriye û dengbêjî kiriye. Bi salan ji bo pêşxistina çanda dengbêjiyê xebat... **R.12**

xwebûn

17-23 GULAN 2021 HEJMAR: 74 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

Tiliya di kunmozê de!

Li dibistana 'Brynas', bi Eva re em ketin dersa pola çaran. Dersa me li ser mîtolojiya swêdiyan bû. Eva gelekî ji xwe razî bû û hulkasî jî bi xwe dadiket. Bêhemdî, li şûna wêneyên mîtolojîk, yên newiya xwe nîşanî şagirtiyan xwe da. Dûra lêborîn ji şagirtan xwest û dest bi dersê kir. Xala bingehîn ya mîtolojiya swêdiyan xweda û xwedawendên ASA (Asa gudar) ye. Di mîtolojiya yewnana de Zeus çawa be, di mîtolojiya swêdiyan de jî Oden wisa ye. Li gorî mîtolojiyê, ji bo zanyariyê bi dest bixe û wê ji binê birê derîne, Oden çavek xwe kiriye gorî. Van demên dawî zana, lêkolînerên kurd... **Seyidxan Anter / R.5**

Hêj cejn nehatiye welatê me

Di van rojan de em zêdetir di dukikên dilê xwe de bi şîrê xwedawendan helbestan dimeyînin ji wan re. Ji ax û avê, nan û baranê, ji ba û bahoza, ji rondikên çavên me, hezkirin û evînên me, ji keserên kûrahiya dilên me, ji çiyayên pişt û pala baweriya me, ji deştên sîng û berê welatê me zêdetir bêhna wan tê di van rojan de. Wekî dayîk û bav, xwişk û bira, yar û dildar pêçekên janêyên di dergûşên dilê me de bê hedaritir dibin van rojan. Rondikên me ji baranan zêdetir, keserên me ji deryayan kûrtir, bêriyên me ji şadiyên me pirtir dibin di van rojan de... **Reyhan Îke / R.6**

Ma bi estanikan mexepenê

Heme domanî estanikan reyde pîlî benê. Estanikî, behskerdişê qewimîyayîşanê raşt, nîzdiyê raştiye ya zî mîtoloji yê. Bi awayêko kilm û bi vengeko weş yenê vatîş. Estanikî nîfşan ra derbasê nîfşan benê û heme estanikan de bale ancîyeno qewimiyayîşêk ya zî rewşeke ser o. Estanikî her netew û çandî de estê. Her çandêk de bi awayêko ciyayî yenê vatîş. Çand senîn bibo, estanikî zî goreyê aye ameyê afirnayene. La tay estanikî estê ke hetê dewletan ra seba empozekerdişê rolan ro civatî yenê bikar ardene. Çend estanikê klasîkî estê. Nînan ra yew zî estanika 'Sîndîrella' ya Estanike de Sîndîrella... **Helîn Uzel / R.9**



Bila her roj bibe Cejna Zimanê Kurdî!

Ji ber nexweşiya koronayê Cejna Zimanê Kurdî îsal bi daxuyaniyan û bernameyên online hat pîrozkirin. Platforma Zimanê Kurdî bi daxuyaniyê Cejna Zimanê Kurdî pîroz kir û xwest zimanê kurdî bila bibe zimanê perwerdehiyê û zimanê fermî. Li Nisêbînê malbata Koç li malê cejna ziman pîroz dikin û bang li hemû kesî kirin ku li zimanê xwe xwedî derkevin.




Pîl

Her helbest tîrêjek e ne? Ev helbest jî heyvek berê gihîşt dilê min û pê hesiyam ku dil ne 'pîl' e ne jî 'bi pîlan dişuxule!' Lê ji zordestan re dilê me wekî 'tiştekek ku tim dikare were dagirtin' tê xwiyan. Sedemên wê pir in lê yek jî ew e ku; "dilê me" bi rastî jî carna bûye "tiştekek li ber destên wan" û kengê xwestine wî dagirtine. Yanî dil carna 'bi pîlên xelkê-zordestan-bûye pizot!' Bûye pizot û xwe û derdora xwe şewitandiye. Loma jî wekî ku tîrêja vê helbestê jî nîşan dide; divê mirov... **Mizgin Ronak / R.2**

Meşa Jiyanê ya Kerem Bîlen

Berê jî fikrekeke min a bi vî rengî hebû lê piştî ku min romana Kerem Bîlen a bi navê Meşa Jiyanê xwend ew fikir êdî bêtir di serê min de rûnişt. Mijara nivisandina bûyerekekê ku te neçar bike tu binvîsî tiştekek e û tu xwe neçar... **Rizoyê Xerzî / R.5**



GREV DIDOME

Di tecrîdê de sînoran nas nakin... **R.3**

MALBATA ŞENYAŞAR

Di qedexe û cejnê de jî edalet xwestin... **R.3**

Bi çanda xwe perwerde dibin

Rojnameya me xwest ji nêz ve rewşa zimanê kurdî û perwerdeya li Rojavayê Kurdistanê bişopîne û ji xwînerê xwe re pêşkêş bike, ji ber vê yekê me ev hevpeyvîn bi Darwîn Darî re ku mamosteyekî zimanê kurdî ye çêkir û wî jî rewşa dawî ya ziman bi me re parve kir. Darî anî ziman ku piştî Şoreşa Rojava gelek tişt guherîn, êdî bi çanda xwe perwerde dibin û wiha axivî: "Ez jî nîfşê destpêkê bûm

ku em çûn û derbasî dibistanan bûn, di şoreşê de ji kêfan re gihîyê min dihat. " Darî behsa zehmetiyên ku xwendevan dikişînin kir û wiha got: "Xwendekarên kurdî herî zêde zehmetiyan ji aliyê nûbûna têgînan, nezaniya xizmên wan bi zimanê dayîkê da ku bi zarokên xwe re alîkar bin û ya din jî kêmûna jêderên kurdî da ku ji xwendekaran re alîkar bin"... **Hevpeyvîna Evîn Hesen / R.4**



Sozdar Koçer

“[...] Qey ez ne jin im? Mêr dibêje, dema jin li erebeya hespan siwar bibin, dema cihokê derbas bikin divê alîkariya wan bê kirin û li her deverî divê cihê herî xweş para wan be. Kesî alîkariya min nekiriye, ku ez li erebeyekê siwar an jî cihokekê derbas bibim an jî cihê herî xweş dabe min. Ma qey ez ne jin im? Bala xwe bidine min! Bala xwe bidin destên min! Min cot kir, çand û çinî û tu mêrek ji min re negot divê çi were kirin! Ma qey ez ne jin im? Ez dikaribûm wek zilamekî kar bikim û xwarinê bixwim — gava ku têra me didane me — û ez dikaribûm qamçiyên jî rakim. Qey ez ne jin im? Min 13 zarok anîn dinê û min dît çawa piraniya wan ji bo koletiyê hatin firotin û gava ez li ser wan digiriyam, kesî dengê min nedibîr xwe ji bilî Îsa! Qey ez ne jin im? [...]”

Ev qismek ji axaftina şoreşgera azadiyê Sojourner Truth a kole ye, ya ku di nav tevgerên jinan de deng veda û heta roja me ya îro bi berdewamî bandora xwe li perspektîvên femînîzma dike. Truthê vê axaftina xwe di sala 1851’an de li kongreya mafê jinan a li Akrona Ohio yê kir û bi vê pirsra ‘Qey ez ne jin im?’ rê li ber nîqaşên ji dema xwe pêşdetir vekir û nakokiya mafê jinan a wê heyamê derxist holê. Sojourner Truthê bi tecrubeyên xwe yên jiyani, dijberkirin û nedîtina wê wek jinek reş li Amerîkayê parve kir. Wê bi vê axaftinê ne bi tenê nijadperstî û bindestiya çînan di nav tevgerên jinan de rexne kir, her wiha tunebûna mafê hîlbijartinê ji ber sedema hiyerarşiya zayendî ya di civakê de jî. Jinên reş hem ji civaka serdest a mezin û hem jî ji civaka reş bi zayendperestî û dijberkirinê re rûbirû diman. Truthê balê dikşand ser rewşa jinên reş ku tecrûbeyên wan ji tecrûbeyên zilamên reş û yên jinên spî cûdatir e. Wê rexne dikir ku ji bo jinek wek wê, cih di femînîzma jinên spî yên rojava û di çîna navîn de tune ye. Li gor arşîvên hêyî wisa tê xuya ku yekem car Truthê rexneya ku rojava tevgera jinan ne bi tenê li ser mafê jinan ê hîlbijartinê be, lewra divê pirsgirêka çîn, zayendperestî û nijadperestiyê jî bigre hundirê xwe. Piştî vê rexneyê û tecrûbeyên civakê, gelek jinên reş di tevgera

femînîzma reş de bi teorîya ‘critical race’ -rexneya nijadê, li ser femînîzma civaka mezin a spî lêhûrbûnên xwe pêş xistin. Zahfê wan em dinasin wek Audre Lorde, Angela Davis, Bell Hooks, Patricia Hill Collins û yên dîtir. Piştî 150 sal xebat, lêhûrbûn û têkoşîn ev şêwaza dijberkirina pir car a ku di konferansa mafê jinan de bûbû mijar hate binavkirin. ‘Intersectionality’. Hevoka ‘intersectionality’ cara yekem ji aliyê parêzera amerîkî Kimberle Crenshaw ve di sala 1989’an de hate bikaranîn, da ku bi vê hevokê nîqaşên femînîzmê bi yên nijadperestiyê ve girê bide. Mirov dikare bibêje ku tecrûbeyên jinên reş û lezbiyanan bingeha vê mijarê bûn, ji ber ku ew di femînîzma spî, jinên heteroseksuel ên çîna navîn de nedihatîn temsîlkirin.

Wateya ‘intersectionality’ çi ye?

Di nîqaşên niha yên femînîzmê de ‘intersectional’ piranî wek perspektîvek erênî û bi kêrhatî hatiye belav kirin. Ka em bala xwe bidinê ev perspektîv tê çi wateyê? Perspektîva ‘Intersectionality’ ji hevoka inglîzî ‘intersection’ tê û tê wateya xaçerê ango cihê ku gelek rê di ser hev re derbas dibin. Crenshaw vê têgihê ji bo her xaçerêyê ango têkiliya dijberkirinê civakî û pêwendî ya desthilatdariyê bi kar dianî. Dema em vê têgihê di şexsê Audre Lordeyê de bînin ziman dê wisa be — Lorde jineke reşî lezbiyen bû û astengiye wê yên fizikî hebûn. Dema ev jin bihata dijber ango marjinalkirin, gelo em dikarin bi zelaî bibêjin ji ber kîjan kategoriyê hatiye dijberkirin? Dibe ku ji ber nijadê be (reş)? Ji ber zayenda civakî (gender)? Zayenda biyolojîk (seks)? An jî ji ber ku miroveke bi asteng e? Em li gorî lêhûrbûnên tevgerên femînîzma spiyan binêrin, em ê teqez bibêjin ev jin bi tenê ji ber kategoriyeke hatiye dijberkirin ew jî yan ji ber zayendê yan jî ji ber nijada xwe ye.

Ji Truthê bigre heta Crenshaw û hevalbendên wan vê lêhûrbûnê kêmkirî bi pirsgirêk dibînin. Ew dibêjin ku mirovek dikare ji ber gelek kategoriyên ku di heman demê de pêk tên, bê dijberkirin. Ev kategorî tev bi hev re honandî ne û nikarin ji hev qut û îzole bînin şirovekirin.



Interseksiyoneli paradîgmayek e ku xwe dispêre analîza newekhevî û pêwendî ya desthilatdariya di civakê de. Li vê derê desthilatdariya civakê bi kategoriye zayenda civakî (gender), zayenda biyolojîk (seks), neteweyî, nijadî, gel, nifş, olî, hawirdora civakî, astengiye taybet hwd. tê destnîşankirin.

Di şûna ku yek dido kategorî li hev bînin zêdekirin an jî her yek ji hev cûda bê dîtî, ev konsept diyar dike ku kategorî tev bi hev ve honandî ne û geh hev beramber xurtqels dikin geh jî hev diguherînin. Di vê derê de giranî li ser newekheviya civakê ye ku di heman demê de hev bandor dike.

Ev paradîgma tê çi wateyê?

Di roja me ya îro de em li her deverên cîhanê dibînin çawa jin — çawa mirov dibin qurbanîyên kate-

goriye civaka serwer. Heta niha tevgerên jinan ên civaka serwer çi li Amerîkayê, çi li Kurdistanê, çi li Ewropayê û çi li deverên din bin, kategoriye heyî ji hev cûda û wek pirsgirêkek xwerû digrin dest. Ev jî qet nebûye bersiv ji dijberkirin û tundiya ku ji aliyê civak û dewletê ve tên kirin. Em vê mijarê bînin ser rastiya xwe wek kurd - jineke kurd li metropolên Tirkiyeyê ne bi tenê ji ber zayenda xwe, her wiha di heman demê de ji ber nijad, ol û çîna xwe jî tê dijberkirin. Ev kategorî nikarin ji hev cûda bînin kirin. Lewra ev konsept pêşniyar dike ku divê em di analîza newekheviyê de bi gelemperî li rewş/mijarê binêrin û hişyar tevbigerin. Rastiya me wek mirov di analîzkirina newekheviyê de divê ne qiyas be. Da ku rê li ber perspektîva gelemperî û hesasiyeta rewşên dîtir pêkan be.

Xwe di çand û hunerê de nas dike

Dema mirov dibêje çand û huner, di despêkê de civak tê bîra mirovan. Civak dikare bi parastina çandê hebûna xwe mayinde bike. Li bakur û rojhilatê Sûriyeyê gelek jin û ciwan tev li xebatên çand û hunerê dibin û bi amûrên cuda çanda xwe nûjen dikin. Yek ji wan jina ciwan Zelal Musa (17) ye ku ji bajarê Qamişloyê ye. Zelal ev 6 sal in cihê xwe di navenda Tevgera Hîlala Zêrîn de digire û bi çîrok, şano û muzîkê xwedî li çanda xwe derdikeve.

Zelal, diyar kir ku ew di 11 saliya xwe de tev li xebatên çand û hunerê bûye û xwe ji her alî ve pêş xistiye.

Jina ciwan da zanîn ku ew hunerê ji dayika xwe fêr bûye û ev tişt anî zîman: “Ji zaroktiya min de da-

yika min cihê xwe di nava çand û hunerê de digre û dengbêj e, xalkî min cihê xwe di nava beşê govendê de digirt, em malbatek ji çand û hunerê ne dûr bûn. Ji ber wê min tu zehmetiyên mezin û

giran li pêşiya xwe nedît û malbatê her dixwest ez di nava hunerê de mezin bibim. Dema ez ketim nav xebatên çand û hunerê, malbata min dixwest ez fêrî amûra tembûrê bibim, lê min bêtir gitar nêzî xwe

dît, loma min xwe fêrî amûra gîtarê kir. Çand û huner hebûna min e, ez xwe di nava çand û hunerê de ava dikim û sekneke min di nava civakê de çêdibe. Dîroka me di çanda me de ye, dema ku em vedigerin dîroka xwe em xwe û çanda xwe nas dikin, êdî em bi berhemên xwe çanda xwe nûjen dikin, her ku ez çîrokekê dibêjim, muzîkekê lê didim û şanoyekê pêşkêş dikim ez xwe di van berheman de nas dikim û ava dikim, ev jî dibe parastina çanda dayik û dapîrên me û avakirina pêşerojek baş.”

Her wiha Zelalê bang li civakê bi taybetî li jinan kir ku bila vegerin ser çanda xwe û xwe bi çanda xwe nas bikin. **QAMIŞLO**

Mizgîn Ronak

Pîl

Te digot qey
dilê te jî bi pîlan dişuxule
dikana pîlan bû armanca riya te
her kes diçû
Dil dadigirt
bi pîlan dibû pizot
lê dilê te bi baranê dişuxule
dilo li ku ne
ewran li ku hêlin çêkiriye
Digotin dil pîl e
bi pîlan dişuxule
ji bazaran hez dike
kengê bixwazî dişuxule
riste bi teyrên re çûn
dil sekinî
dilê te ne wek ê xelkê ye
ku baran bar dike
disekine û nema lê dixê
niha bi vî dilê sekinî
li pîlên xelkê dimêzînî
li pey baran û risteyan diloînî...

Her helbest tîrêjek e ne? Ev helbest jî heyvek berê gihîşt dilê min û pê hesiyam ku dil ne ‘pîl’ e ne jî ‘bi pîlan dişuxule!’ Lê ji zordestan re dilê me wekî ‘tiştêk ku tim dikare were dagirtin’ tê xwîyan. Sedemên wê pir in lê yek jî ew e ku; “dilê me” bi rastî jî carna bûye “tiştêk li ber destên wan” û kengê xwestine ew dagirtine. Yanî dil carna ‘bi pîlên xelkê-zordestan-bûye pizot!’ Bûye pizot û xwe û derdora xwe şewitandîye. Loma jî wekî ku tîrêja vê helbestê jî nîşan dide; divê mirov dilê xwe tim bipelîne, bibîne ka bi rastî jî yê mirov e yan bi pîlên xelkê dişuxule.

Pîl diqedin, dîsa pîlên nû, dîsa pizotbûyîn! Dûre dîsa valabûn û dîsa qeyrana pîlên nû! Lê ev heye; carna mirov şiyar dibe û dibîne ku way dil êdî ne “dîl” (gelo çima di zimanê me de ‘dîl’ û ‘dîl’ wisa nêzî hev in? Ji bo ku her du ji derveyê daxwaza xwe di nava “tiştêk” de hepsî ne yan sedemên dûvedirêj jî hene?) e û pîl-mîlan qebûl nake! Mesela ev helbest ji şiyariyek wisa çêbû. Min hew dît ku way “bi hin pîlan” xapiyame û min gotiye qey li dilê min tîn, wî dikemilînin û dijjînin. Lê na, na! Ew pîl, ne li gorî vî dilê dîn bûne û ew bê pîl-mîl jî xwe re dişuxule.

Bes, her şiyarbûn; nûbûnek, çareyek, rêyek nû dixwaze. Mada ku bi pîlan naşixule, bi çi dişuxule û yê bi çi bişuxule? Niha hema vê keliyê em bisekinin û wekî dilnasên (kardiologên) çê, dilê xwe bipelînin, çiqas azad e, çiqas xulam... Çiqas bi vîna xwe dişuxule, çiqas bi gotin û pîlên xelkê? Çiqas wekî avê herikbar û nû ye û çiqas bi ferasetên kufikî dişuxule?

Dema ku em bigihîjin encamek, em ê bibînin ku ev encam têkiliya me û pakrewanên delal jî dide xwiyakirin. Lew ew tev kufîlkên nûbûnê bûn; ji bo ku tiştên kufikî û rizî êdî li dilê wan hukum nekir firiyên çûn. Loma jî ku em bihêlin dilê hê jî bi pîlên xelkê yên kufikî û teqiyayî bişuxule û meseleyên xwe yên kesani, malbatî û civakî, bi wî awê bigrin dest, em ê ji tevî berkendalên xazeyî (mecazî) û rastî bikevin erdê.

Mînak; kengê, li kîjan mal û bajarî; ku em bi rêzdarî nêzî înadê jinan nebin dê artêşa pakrewanên jin xezabê li me bibarîne. Kengê, li kîjan navçeyê, bi fikir û pîlên xelkê di têkiliyên xwe yên malbatî û civakî de bibin despot û dîktator dê tîrbarana pakrewanên azadiyê ji ser serê me kêmkirî nebe. Wekî din jî; pêdiviya tu jinê û kurdê/î bi tehekumê tune ye! Lew dagirkeran heta dawî bi tehekumê em êşandine; yekane tişta ku li me tê û li me ferz e; azadî ye! Di bîst û çar saetên rojê de azadî, li gel hev ji bo hev, ji bo xwe azadî! Helbet hê jî bandora pîlên xelkê heye lê em ji bo vê yekê “em” in ne? Ger em nexwazin kîjan pîl dikare dilê me dîl bigire?

Bila ev nivîs, bi helbesteka min a din bi dawî bibe;

Ceyrana her tiştî çûbû
Tarî û bêdeng bû rastî
Dilê te dişuxulî!
Her kes şaşwaz ma
tu bêperwaz
dilê te yê ku di tariyê de dişuxulî
ronî dida dora xwe
lê êvarên dîl
bi kêrî tiştêk nedihatîn.

Di tecrîdê de sînoran nas nakin

Navenda Nûçeyan

Li dehan girtîgehan ji aliyê girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê bi daxwaza tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan were rakirin û zextên li girtîgehan bi dawî bibin di 27'ê mijdara 2020'î de çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger hatiye destpêkirin û çalakî didome. Koma 34'emîn çalakiya grevê dewr girt û çalakî zêdetirî 170 roj in dewam dike. Her wiha bi heman armançê li Kampa Penaberan a Mexmûrê çalakiya greva birçîbûnê hatiye destpêkirin û çalakî zêdetirî 150 roj in dewam dike û çalakiya greva birçîbûnê ya penaberên ku li Kampa Lavrîo ya Yewnanistanê dane destpêkirin nêzî 140 roj in dewam dike.

Bi tecrîdê qanûn tên bînpêkirin
Hiqûqnas Cemîl Tûrhallî li ser tecrîdê û greva birçîbûnê ya li girtîgehan ji ANF'ê re axivî. Tûrhallî diyar kir ku Tirkiye di tecrîdê de sînoran nas nake û wiha got: "Hevdîtina hikumxwaran a bi parêzeran re li gorî girtiyan sînorkirî jî be, di mewzûatê de hatiye destnîşankirin ku mafê hikumxwaran e her roj karibe hevdîtinê bike, heftane karibe malbata xwe bibîne. Eger mirov biryara Dadgeha Destûra Bingehîn bînin bîra xwe ku tespît kiribû mafên birêz Ocalan tene bînpêkirin, hingî eşkere dibe ku Tirkiye hem destûra xwe ya bingehîn, hem qanûnên xwe, hem peymanên navneteweyî yên ku mohra xwe daniye binî, hem jî biryarên Dadgeha Destûra Bingehîn bin pê dike."

Tûrhallî da zanîn ku ger Tirkiye hi-

çalakiya greva birçîbûnê ku ji aliyê girtiyên siyasî ve hatiye destpêkirin di meha 6'an de ye. Hiqûqnas Cemîle Tûrhallî anî ziman ku ger Tirkiye li gorî hiqûqa navxweyî û navneteweyî tevbigere divê tecrîd bi dawî bibe lê di tecrîdê de sînoran nas nakin

qûqa navxweyî pêk bîne divê tecrîdê bi dawî bike û li gorî peymanên navneteweyî Tirkiyeyê li ser mafên bingehîn soz dane lê van sozan bi cih nayne û wiha got: "Ya ku tê xwestin ew e ku Tirkiye destûra xwe ya bingehîn, qanûnên xwe bêyî cudahiya fikrî û nasnameya polîtîk ji bo her kesî bi rengekî wekhev bi cih bîne."

Greva birçîbûnê encama tecrîdê ye
Cîgirê Hevserokên Giştî yê HDP'ê Umîd Dede anî ziman ku greva birçîbûnê ya li girtîgehan belav bûye û didome, encama tecrîda li îmrîaliyê ye û wiha got: "Divê mirov têkiliya grevê û tecrîdê bibîne. Li Girtîgeha Îmrîaliyê hiqûqa taybet û tecrîda giran heye. Ku tecrîda li îmrîaliyê ranebe û pergala neyê guhertin, tu girtiyên din nikarin xwe di ewlehiyê de his bikin. Divê mirov baş sedema grevê bide famkirin û nasîn. Em dizanin rêveberiya girtîgehê cezayê dîsîplînê li girtiyan dibere. Bi cezayê dîsîplînê bêtir mafên girtiyan bi sînor dike. Hemû mafê wan ji destê wan digire. Mirovan dixin hucreyên yek kesî û wan bi tenê dihêlin. Naxwazîna girtî li mafê xwe yê xwezayî û rewşa xwedî derkevin. Em mecbûr in rewşa girtiyan bişopînin û li daxwazên wan guhdar bikin. Bê guman em ê bişopînin û bikin rojev."

Girtî jî hatine tecrîdkirin
Dede xwest ji bo daxwazên girtiyan bê qebûlkirin ne tenê girtî, hemû beşên



civakê têkevin nava têkoşînê û wiha axivî: "Hikûmet di 5 salên dawî de polîtîkayên ewlehiyê zêde dike. Ji bo ev polîtîkayên ewlehiyê bi dawî bibin divê tecrîd bi dawî bibe. Divê Tirkiye di nava xwe de pirsgerêkan bi rêya aştiyane û demokratîk çareser bike. Hemû raya giştî û otorîteyên siyasî yên cihanê tev dizanin ku îro muxatabê meseleyê birêz Abdullah Ocalan e. Ji bo hêviya demokrasî û aştiyê ji nû ve geş bibe, divê teqez tecrîda li îmrîaliyê bi dawî bibe. Li girtîgehên Tirkiye û Kurdistanê tu carî şert û mercên mirovahiyê pêk nehatin."

Bi taybetî di salên dawî de hem ji ber şertên şewba vîrûsa Covîd-19'yê hem jî ji ber polîtîkayên ewlehiyê yên hikû-

metê, girtiyên siyasî ji her demê bêtir bi neheqî û tundiyê re rû bi rû ne. Girtî bi tecrîda giran re rû bi rû ne."

Bi pankartê piştgirî da grevê

Rêveberiya HDP'ê ya navçeya Esenyûrtê ya Stenbolê bi armanca ku balê bikişîne ser çalakiya greva birçîbûnê ya ji bo bidawîkirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û binpêkirinê mafan ên li girtîgehan hatiye destpêkirin, pankarta "Em li dijî şer aştiyê û li dijî tecrîdê jî azadiyê diparêzin, bibe dengê zindanan" bi avahiya xwe ve daliqand. Polîsan bi biryara dozgeriya pankart rakirin, rêveberê navçeyê Fatîh Ergun bin çav kirin.

Girtiyên nexweş terkî mirinê kirine

Navenda Nûçeyan

Li girtîgehên Kurdistan û Tirkiyeyê bi sedan girtiyên nexweş bi mirinê re rûbirû hatine hiştin. Ligel raporên û hişyariya saziyên mafên mirovan girtî serbest nayên berdan.

Komîsyona Girtîgehan a Şaxa ÎHD'ê ya Stenbolê bi boneya balê bikişînin ser rewşa girtiyên nexweş, di heftaya 477'an de çalakiya "Rûniştina F" berdewam kir. Komîsyonê bal kişand ser rewşa girtiyê nexweş Emîn Aladag û xwest Aladag serbest bê berdan. Girtî Emîn Aladag 26 sal in girtî ye. Ji ber îşkenceya giran, milê wî yê rastê û piyê wî yê çepê felç bûye. Hestiyên wî dihelin. Ji ber vê yekê pir zor û zahmetiyê dijî.


Înîsiyatîfa ji Girtiyên Nexweş re Azadî, ji bo girtiyê nexweş Îsmaîl Tamboga (22) ku daketiye 38 kîloyan û bi mamayan dijî banga "paşdextistina înfazê" kir.

Endama Lijneya Birevebirina Navendî (MYK) ya Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD) Nûray Çevîrmen destnîşan kir ku firşika Tambogan zêde diêşe, nikare xwarinê bixwe û ji ber ku her tim vedireşe gelek kîlo wîndar kiriyê û wiha got: "Ji ber şertên girtîgehê nikare bi awayekî tendurîst bijî û daketiye 38 kîloyan. Beriya niha bi qasî salekê li Edeneyê tedawî dîtibû. Niha tenê bi mamayan dijî. Diranên wî şikîyane û devê wî parçe parçe bûye. Bi hinceta pandemiyê diranê wî

nayê tedawîkirin. Tenê ji bo nexweşiya firşikê wî dibin nexweşaneyê."

Komîsyona Girtîgehan a Şaxa Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD) a Îzmîrê, ji bo bale bikişîne ser rewşa girtiyê nexweş Ekîm Polat (24) bi awayekî online daxuyanî da. Rêveberê ÎHD'ê Ahmet Çiçek diyar kir ku Polat bûyî ku hincetek bê nişandan di sala 2008'an de ji Girtîgeha Tîpa T a Akhîsarê sewqî Girtîgeha Tîpa T a Denîzliyê hatiye kirin û di rê de îşkence lê hatiye kirin.

Derbarê nexweşiyên Polat de Çiçek agahî dan û diyar kir ku ji ber nexweşiyên KOAH û dil xetereya ku Çiçek felç bibe û ev bang kir: "Tedawînekirina Polat a li gorî rûmeta mirovahiyê li dijî hiqûqê ye. Ji bilî sînordarkirina fizîkî tu mafê girtiyan nikare bê astengkirin. Divê rayedar berpirsyariya xwe bi cih bînin." Çiçek xwest girtiyê nexweş Polat demildest serbest were berdan.



Malbata Şenyaşar her roj edaletê dixwaze

Emîne Şenyaşar a ku hevjin û 2 kurên wê di encama êrîşa xîzm û parastvanên Parlamenterê AKP'ê Îbrahîm Halîl Yildiz de jiyana xwe ji dest dan û kurê wê Ferît Şenyaşar ku di bûyerê de birîndar xelas bû, nobeta xwe ya "edaletê" ev zêdetirî 70 roj in dewam dikin.

Malbata Şenyaşar, ji ber qedexeya pandemiyê çalakiya xwe li mala xwe

ya li navçeya Pîrsûsê didomîne. Malbatê li ser hesabê xwe yê twitterê ev parvekirin kir: "Weke Malbata Şenyaşar em îro careke din bang dikin. We malbat û cejnên me ji me girtin! Em ê daxwaz û têkoşîna xwe ya edaletê bidomînin. Kesên ku malbata me qetîl kirine wê bîrê darizandin û em ê edaletê bigirin." **RIHA**



Girtî Welat Esen hêjayî xelata Pêşbirka Helbestan a Arjen Arî hat dîtin

Encama pêşbirka Helbestan Arjen Arî ya 8'emîn bi daxuyaniyê hat aşkerakirin. Malbata Arjen Arî û Weşanên Sor têkil-darî mijarê daxuyanî dan û hat gotin ku ev pêşbirk dê gelek helbestvanên jîr bigihîne edebiyata kurdî û bi qelemên wan wêjeya kurdî bi pêştir ve biçe.

Têkil-darî mijarê wiha hat gotin: "Îsal cara 8'emîn e ku li ser navê Arjen Ariyê şairê gewre pêşbirka helbestan tê lidarxistin. Îsal 9 dosyeyan serî li pêşbirkê dan. Juriya îsalîn ji Evîn Şîkakî, Îrfan Amîda, Mueyed Teyîb, Berken Bereh û Necla Arî pêk dihat. Pênc endamên ju-

riyê dosyeyan nixrandin û nîqaşên xwe kirin. Piştî nixrandinê ewil dengdan pêk hat û li gorî vê du dosyeyan weke hev dengdan wergirtin. Loma jî di merhaleya duyem de puandan pêk hat û li gorî pûandanê dosyeya ku herî zêde pûan stend îsal hêjayî xelatê hate dîtin.

Weke encam dosyeya Welat Esen bi dosyeya xwe ya bi navê Ev Rû, Ev Xerîbî hêjayî xelatê hate dîtin." Welat Esen ê xelat wergirt ev 26 sal in girtî ye. Malbata Arjen Arî û Weşanên Sor, di daxuyaniyê de diyar kir ku îsal Kadîr Înanîrê listikvanê sînemayê hêjayî xelata

rûmetê hate dîtin û wiha got: "Heke rewşa pandemiyê destûr bide dê merasîma xelatdanê rû bi rû bê lidarxistin, heke na dê bi awayeke online li dar bikeve. Derheqê merasîmê de em ê di rojên bê de agahiyê bidin raya giştî." **AMED**

ŞOREŞA 19’Ê TÎRMEHÊ BI XWE RE GELEK TIŞT GUHERTIN Êdî em bi çanda xwe perwerde dibin

■ Evîn Hesên

Rojnameya me xwest ji nêz ve rewşa ziman û perwerdeya li rojavayê Kurdistanê bişopîne û ji xwînerê xwe re pêşkêş bike, me ev hevpeyvîn bi Darwîn Darî re kir ku ew mamosteyekî zimanê kurdî ye û wî rewşa dawî ya ziman bi me re parve kir.

Tu dikarî ji kerema xwe hinekî behsa nîfşê xwe û têkiliya xwe ya bi zimanê kurdî re bikî?

Ez ji nîfşê destpêkê bûm ku em çûn û derbasî dibistanan bûn di Şoreşa Rojava de. Ji kêfan re giryê min dihat, dema ez derbas dibûm û min zarokên kurd fêrî zimanê wan dikirin. Piştî min li peymangeha kurdî ya bi navê Peymangeha Cegerxwîn xwend û bawername wergirt û du salan lê mamostetî kir. Jixwe xwendina me li peymangehê hem wêje û hem rêziman bû. Piştî du salan Zanîngeha Rojava dest bi xebatên xwe kir û ez ji hêla rêveberiyê ve di sala 2016’an a vekirina wê de ji bo mamostetiya beşa wêjeya kurdî hatim pêşniyarkirin.

Ji aliyê wêjeyî ve bandora nivîskar û zimanzanên kurd yên wekî Cegerxwîn, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Celadet Alî Bedirxan, Osman Sebrî, Reşîdê Kurd û Samî Tan li ser min çêbûn. Her wiha bandoreke mezin a dapîrê min Eliyê Darî (nasnav Elofat) li ser min hebû û heta niha dengê wî di guhên min de ye.

Ji aliyê wanedayînê ve, min bi salan waneyên zimanê kurdî dane. Bi rengekî veşartî, li malên kurdên ku hezkerên zimanê xwe bûn û dixwestin zarokên xwe fêrî kurdî bikin, min ders dan. Weke erkekî li ser milê min, ji sala 2002’an ve min ji bo zarokan dest bi fêrkirina zimanê kurdî kir. Her wiha ji aliyekî din ve min ew fêrî stran û tembûrê dikirin. Ew perwerde ne beramberî diravan bûn, lê tîrsa ji dewletê ya li cem gelekane nedihîşt ku zarokên xwe fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî bikin û ev yek jî cihê xemgîniyê bû ji bo min. Çilo mirov bitirse zimanê xwe fêr bibe.

Di encama perwerdeya min a zaroktiyê de û bi saya kurdperweriya bavê min, ê ku hevaltiya kesên mîna Cegerxwîn, Reşîdê Kurd, Sebrîyê Xelo Sîfî kiribû û bi saya serê Mihemed Eliyê Hiso ez fêrî zimanê xwe bûm.

Bi demajoyê re û di encama xwendina min de; ji pirtûkên kurdî yên bavê min ji min re dianîn, çî pirtûkên ziman û rêzimanên kurdî, çî jî pirtûkên wêjeyî û pirtûkên

siyasî, min Kurdistan a xwe bi dîrok û cografîya wê nas kir. Her wiha kesên ku ked û xebat bi salan nas kirin ku di ber vê xakê û di ber ziman û wêjeya wê de ev ked û xebat kirine.

Ji aliyekî din ve her du bapîrên min anku bavê bavê min û bavê dayîka min girêdayî zimanê xwe bûn, yek jê stranên folklor (Elofat) ji me re distran, her wiha stranên wî bi xwe hebûn ên heta roja îro tîrên strîn di nava kurdan de mîna strana (Eyşana Elî) û bapîrê min ê din jî bi sedan helbestên Cegerxwînê nemir ji ber kiribûn û li gel me digotin. Jixwe bandora vê sêgoşeya Amûdê, Qamişlo, gundê Dara yê kevnar li ser kesên vê herêmhê heye. Êdî em li ser perwerdeyekê xwedî bûn ku şer di navbera me û dagirkerên Kurdistanê de heye û çeka herî xurt ji bo şerê dijminê me zimanê kurdî ye, ji ber ku hebûna me bi hebûna zimanê me ye.

Hezkirina ziman û wêjeya min a kurdî roj bi roj mezintir dibû, êdî bi rojan ji bo peyda kirina pirtûkên rêziman ên cur bi cur lêgerîn û xebatên min çêbûn. Ji ber ku ew têgînên li cem Celadet Bedirxan, ne heman têgîn bûn li cem Reşîdê Kurd û alfabeya Celadet Bedirxan û ya Osman Sebrî ji hev cuda bûn, her wiha nêrînên wan ên rêziman û rênivîsê jî cuda bûn. Ev yek jî rewşeke asayî bû Celadet dît ku bikaranîna alfabeya latînî ji ya aramî çêtir e.

Dema ku min ji bo ziman û wêjeya xwe dest bi lêkolînan kir, wê çaxê bavê min got êdî tîrs li ser te nemaye û divê tu nameya mamosteyê xwe Mihemed Eliyê Hiso yê bavê du şehîdan bû, di ber Kurdistanê de berdewam bikî. Name û qewîtiya wî ji min re divê ez gelê xwe fêrî zimanê kurdî bikim.

Ziman ji bo te tê çî wateyê?
Di zaroktiya me de her dem bavê min ev axaftin ji me re dianî ziman: Axaftineke yewnanî ya kevn heye dibêje: ‘Xwe nas bike’. Ger mirov bixwaze xwe nas bike, nexasim mirovê kurd ê bi sedan salan di bin dagirkeriyê de maye; divê zimanê xwe nas bike da ku zanibe ew kî ye û dîroka wî çî ye?” Kêmhê zêde em tînedigihîştin wateya kûr a vê axaftinê, lê ya ku li ser me weke zarokên wî hatibû sepanandin ew bû; divê em fêrî zimanê xwe bibin.

Beriya Şoreşa 19’ê Tîrmehê, rewşa zimanê kurdî çawa bû û niha çawa ye?
Beriya Şoreşa 19’ê Tîrmehê hemû hewldanên fêrbûna zimanê

Ez ji nîfşê destpêkê bûm ku em çûn û derbasî dibistanan bûn di Şoreşa Rojava de ku ji kêfan re giryê min dihat dema ez derbas dibûn û min zarokên kurd fêrî zimanê wan dikirin

kurdî bi rengekî raz û veşartî bûn, her wiha takekesî bûn, ji lew re hejmara kesên fêr dibûn pir hindik bûn. Xala din a sereke beriya vê şoreşê fêrbûn tenê fêrbûna xwendin û nivîsandina zimanê kurdî bû. Wekî din, li dibistanan giştî zanist bi zimanê erebî bû ku vê yekê bandor hîno hîno li windabûna hin peyvên kurdî yên ku peyvên erebî şûnê digirtin. Di destpêka Şoreşa 19’ê Tîrmehê de, bingehek ji bingeheên wê yên sereke perwerde û fêrkirina bi zimanê dayîkê bû. Ev xala sereke ji bo kesên wekî min ku di wê tîrê de fêrî zimanê xwe bûbû û rojek hatiye dibêje divê mirov bi zimanê xwe fêr bibe, ev yek mîna xewnekê bû. Jixwe di destpêkê de perwerdeyên fêrbûna zimanê kurdî bûn û di roja me ya îro de zanîngeh di bin siya vê şoreşê de bi salan e xebatên xwe yên bi zimanê dayîkê dikin.

Saziyên zimanê kurdî bo standertkirina zimanê kurdî çî xebat kirin?

Di encama perwerdeya zimanê kurdî de ku bi salan çêbûye, gelek pîrsgirêk derketin holê. Ji aliyekî ve standardek ji alfabeya me re peyda nedibû û ji aliyekî ve hê pirtûk ji bo gelek zanistan tune bûn. Êdî ev yek bi xwe weke arîşeyekê bû, lê rojên derbasbûyî tekez kirin ku pîrsgirêka tunebûna pirtûkan ji holê rabû û ji bo rêzimanê jî hem lêkolîn li Rojavayê Kurdistanê bi xwe hene û hem jî sûdgirtin ji lêkolînen parçeyên din hene. Nexasim Bakurê Kurdistanê, di warê rêzimana kurmancî ya ku li vir tê xwendin.

Pîrsgirêkên zimanê kurdî çî ne, tîne guhertin an na?

Li Rojavayê Kurdistanê û taybet saziyên ku xebatan dikin ji bo ziman, ji bo yekkirina rêziman û rastnivîsa kurdî ya ku gelek aloziyên wê hene, gelek hewldan tîrê dayîn. Lê ew rastî hin arîşeyan tîrê. Li Rojavayê Kurdistanê, ji aliyê zimanzanên me ve li ser rêziman û rastnivîsîna kurdî erêkirineke giştî tune ye. Her wiha ji bo perwerdeyê bi sed hezaran pirtûk çap bûne û eger ev rastnivîsa nû bi cih bibe divê hemû pirtûk ji nû ve werin çapkirin.

Ji bo yekkirina zimanê kurdî, li Rojavayê Kurdistanê çî xebat tê kirin?



Ez dixwazim bibêjim ku tevî hemû astengiyên ku zimanê me tê re derbas dibe, lê cihê şanaziyê ye û babetêke siruştî û asayî ye ku ev astengî derkevin da ku em çareyekê jê re bibînin û van salên perwerdeyê diyar kir ku ji aliyê saziyên ziman ve nermbûn heye ji bo guhertinan.

Ger perwerde bi zimanê kurdî hebe û berdewam be, wekî din her tişt dê hêsan be û dema me dema guhertinê ye. Loma guhertin di ziman de jî pêwîstîyeke dîrokî û zanistî ye. Heger ev guhertin çênebin, nexwe em di rêya şaş de ne, lê weke me got em di rêya rast de ne û perwerdeya me ji refa pêşdibistan heta masterên zanîngehê nîşana herî berbiçav e ji vê axaftinê re.

Tu xebatên ciwanan ên ku niha tîne çapkirin çawa dinirxîni?

Ji bo xebatên ciwanên me yên îro ên çî li ser wêje û çî jî li ser rêzimanê bin; mirov ji bo van xebatan serbilind e ku di demeke kurt de dikaribûn bi hezaran berhem weşandin. Wekî tiyekî avê bibîne û li şûna ku van ciwanan derbirîna xwe bi zimanê dagirkerên xwe dikirin û ji bo wan a rast ew bû, êdî di encama şoreşê de dagerîn û zivîrandinek pir mezin çêbû. Ez bi hêvî me ku ciwanên me xemsariyê nekin karên xwe, lê berevajî bêhtir giraniyê bidin berhemdayînê da ku xwînerên zimanê kurdî her dem li pirtûkxaneya kurdî vegere û pêwîstiya wî di wê pirtûkxaneyê de biqede.

Xwendekarên kurdî herî zêde di kîjan aliyê de zehmetiyê dibînin?

Xwendekarên kurdî bi taybet xwendekarên amadeyî, peymangeh û zanîngehê herî zêde rastî van zehmetiyan tîrê; rastî têgînên nû tîrê, nezaniya xizmên wan bi zimanê dayîkê bandorekê li ser wan çêdike, kêmbûna jêderên kurdî, .

Çima hîna jî gelek kes zarokên xwe dişînin dibistanên ku perwerdeya xwe bi zimanê erebî dikin, sedema wê çî ye?

Heta roja me ya îro kurdên me bûne du alî, yek jê bi zimanê xwe bawer e û xwedî li vî zimanî derdikeve û loma zarokên xwe jî dişînin dibistanên zimanê kurdî. Aliyê din ên ku di nêrîna wan de siberoj anku dema bê ne ji vî zimanî re ye û tu hêvî ji vî zimanî tune ye, jixwe ev yek vedigere bandora hîzr û ramanên dagirkerên Kurdistanê li vî gelî ku serkeftina xwe di rêya dagirkerê re dibîne.

Li gorî azmûna te ya di mamostetiya kurdî de herî zêde hûn wekî mamosteyên zimanê kurdî di kîjan aliyên de zehmetiyê dibînin û bi çî pîrsgirêkan re rû bi rû ne?

Zor û zehmetiyên zimanê me ku standardek ji zimanê me re tune ye û weke me diyar kir ji bo xwendekaran ku kêmpêdbûna jêderan, heman kelem e ji mamosteyan re. Her wiha gelek ji xwendekaran tîrê û çanda dagirker bi xwe re tînin. Jixwe ev jî demekê dixwe heta ku mamoste wan dîrî ve çandê bixe û fêrî çanda wan bike.



Darwîn Darî kî ye?

Darwîn Darî di sala 1976’an de li Qamişlo ji dayik bûye. Wekî gelek mabatên rojavayê Kurdistanê malbata wan jî ji gundê Darê yê bakurê Kurdistanê ji ber zilm û zordariyê koç Binxetê bûne û li gundê li nêzî Amîdê bicih bûne. Berpîrsê beşa ziman û wêjeya kurdî ye li Zanîngeha Rojava, her wiha hin xebatên wî ên di warê wergerê de hene ku bûne berhem. Berhemên wî di warê wergerê de weke pirtûk hene; Orkêş, Raza Libên Baranê û hin çirok jî hene.

Tiliya di kunmozê de!



Seyidxan Anter

Li dibistana ‘Brynas’, bi Eva re em ketin dersa pola çaran. Dersa me li ser mîtolojiya swêdiyan bû. Eva gelekî ji xwe razî bû û hulkasî jî bi xwe dadiket. Bêhemdî, li şûna wêneyên mîtolojîk, yên newiya xwe nîşanî şagirtiyan xwe da. Dûra lêborîn ji şagirtan xwest û dest bi dersê kir. Xala bingehîn ya mîtolojiya swêdiyan xweda û xwedawendên ASA (Asa gudar) ye. Di mîtolojiya yewnanan de Zeus çawa be, di mîtolojiya swêdiyan de jî Oden wisa ye. Li gorî mîtolojiyê, ji bo zanyariyê bi dest bixe û wê ji binê bîrê derîne, Oden çavek xwe kiriye gorî.

Van demên dawî zana, lêkolîner û nivîskarên kurd wekî Bahoz Şawata, Evîn Çîçek, Mihemed Erzuromî û gelek kesên din, dest avêtine mijarên dîrokî, serpêhatî, wêje û mîtolojiya xwe bi xwe dinivîsînin.Yek ji van berhe­man, di roja pitûkan ya UNESCOyê de, weşanxaneya APEC bi navê *Mala Zalê û Teyrê Sîmir* berhemek çap kir. Nivîskarê pirtûkê Amed Tîgrîs e. Amed Tîgris bêhtir bi berhemên xwe yê di derbarê ziman û perwerdeyê de, kitêbên bi navên Licê û Amedê naskirî ye.

Bi bejneke kin, gotinên giranbiha, meraqdariyek zarokan û zanyariyeke pîran, bi karê xwe rabûye û tiliya xwe kiriye kuna mozan. Wa xuyaye Restemê Zal "xortê licî" terkedinya kiriye.

Tirkan bi filmê “Zaloglu Rustem”, Restem kirine xizmê xwe, ne tirk lê turkmen. Faris Restemê Zal wek lehengê xwe dibînin. Hin nivîskarên

kurd jî, bi kefteleft li dijî wê texribatê derketine û tûşî çewtiyên mezin bûne. Restemê Zal anîne çiyayên dora Licê, çiyayên hemberî Farqînê, an jî mîna Amed Tîgrîs dibêje: “Ris­tem anîne Amedê, birine ber Pira Dehderî, li Mizgefta Mezina ya Amedê pê nimêja î­nê dane kirin. Bi­rine Xana Hesên Paşa ya ku di nav-

bera salên 1572 û 1575’an de hatiye çêkirin çayê dane wî...” Helbet mafê mirov û fantazi­yê heye , lê heyra Zerdeşt li ku û Muhemed li kuderê!

Amed Tîgrîs, Amedî birine Zibilis­tanê an jî Sistanê, nêzîkî Xorasanê, warê Mala Zalê. Û çaxa wan dibe wir, em fêrî pêwendiyên cîvakî û aborî yê serdema kevnar dibin: "Ji her derê

welêt û heta ji Amed, Hatûşa, Nîno­vayê dîwarbend, dartiraş, hesinkarên herî binavûdeng û xwedî huner kom kiribûn. Bi sedan kole û dîl li ber des­tên wan dixebitîn. Bi gilare, qîtor û mence­nîqan kevir û mermerên mezin derdixistin qatên jorîn. Ji ax û xîz (qûm) rêyên evrazî çêkiribûn." Helbet mirov nikare bi çavên îro li doh bi­nêre.

Dibêjin dîrok ne wek kopya xwe, lê mîna alimê rûs gotiye; bi kiras û re­ngekî din xwe dubare dike. Çaxa em bala xwe bidin serpêhatiyên Ka­wayê Hesinkar û Mala Zalê em vê yekê dibînin: Em carek din dibînin, di warê egîdî û qehramantiyê de ne hêsan e kes lingên xwe li yên kurdan bide. Em carek din dibin şahid, ji serdema mala Zalê û wir de, kurd ji xwe bêhtir bi kêrî xelk, ol û netewên din hatine. Û hîna jî ji wê toz û gemarê me xwe têr daneweşandine.

Nivîskarê *Mala Zalê û Teyrê Sîmir*, Li nav bexçê ol, evîn, adet û folklor­a kurdan, derketiye seyranê. Diyaloga bi Zerdeşt re, ya di der heqê hizra çê, gotina baş û kirina rind de alîkariya me dike ku em ola wî binasin. Ji der­hêneran re materyaleke film û tiyat­royê pêşkêş dike. Vê pirtûkê, hestên evînî yên ji kûrahiya dilên kurdan carek din fûrand...

Amed Tîgrîs nexşeyekê pêşkêşî me kiriye. Nexşeyeke ku piraniya me hay jê tune bû. Li hespê xwe siwar dibe, di nav sînoren mîtolojî, dîrok, çand û wejeyê de, di navbera bûyer û fantazi­yê de diçe û tê. Hespê wî lê germ bûye.

Îca te dil hebe tu mîtolojiya kur­dan çêtir bizanibî û "moz bi te vene­din" pirtûka *Mala Zalê û Teyrê Sîmir* ji te re alîkar e!

Nûh pêxember û Çiyayê Cûdî

Konê Reş

Piştî tofana Nûh Pêxember, mirov li herêma Botan anko Mezra Botan; bajarê Şernex û Cizîra Mîr Şeref bi cih bûne. Pişt re di cîhanê de belav bûne. Dibêjin dema keştiya Nûh pêxember ji Eynsîfnê dest pê kiriye û li ser çiyayê Cûdî sekiniye, nav li çiyayê Cûdî hatiye kirin û gotine (Cî dî), anko keştiya Nûh Pêxember cihek ji xwe re dît. Di Qurana pîroz de jî hatiye: (We es-tewet e'llell Cûdî), anko keştiya Nûh pêxember li ser çiyayê Cûdî sekiniye...Jixwe dibêjin ku peyva Mezopotamya di heyama Yewnan û Romayê de ji Mezra Botan hatiye girtin..!

Hem jî di nav Kurdan de belav e û dibêjin; di heyama tofanê de, dema keştiya Nûh di ser çiyayê Şingalê re derbas bûye, li çiyayê Şingalê ketiye û kunek tê de hatiye vekirin. Marê Reş xwe kiriye guloftek û ew kun girtiye.. Û dibêjin ku kevokê bi nikilkê xwe, şaxek ji dara zeytûnan, wek mizgînî ku nêzîkî bejayê bûne, ji çiyayê Cûdî ji Nûh pêxember re biriye û ji wê hinge ve kevok û şaxikê zeytûnê bûne sembola aşîtiyê!.

Herviha dibêjin ku navê Nûh pêxember ji gotina (Nû) a kurdî hatiye, bi wateya nûbûnê. Ji ber ku dinya di wê hingê de ji nû ve hatiye ava kirin.. Dema ku Nûh û her heştê hevalên xwe, li ser çiyayê Cûdî ji keştiya xwe daketine, ji xwe re di quntara çiyayê Cûdî de gundek bi navê Heştêyan ava kirine..

Ew gund ta roja îro jî di pala çiyayê Cûdî de ye. Xuyaye ku di pey gundê Heştêyan re, bajarê Şernexê hatiye avakirin û jêre gotine Şarê Nûh anko bajarê Nûh an şarê Nû. Bi dirêjîya demê û pîrbûna mirovan re xelk ji herêma Botan derketine û li dinyayê belav bûne û weha kurdmanç li cihê xwe, herêma Botan mane û ji wan re hatiye gotin Kurdmanç, anko (Kurd Man li Cî). Di baweriya min de bajarê Cizîra Botan ji kur­dan re mîna bajarê Mekeya Ereban e. Zi­manê wê jî ji kurdan re mîna zimanê Qureyşîyan e ji ereban re.. Hûn çi dibêjin?!

Nêrînek li ser romana Meşa Jiyanê ya Kerem Bîlen

Rizoyê Xerzî

Berê jî fikrekeke min a bi vî rengî hebû lê piştî ku min romana Kerem Bîlen a bi navê Meşa Jiyanê xwend ew fikir êdî bêtir di serê min de rûnişt. Mijara nivisandina bûyere­kê ku ew te neçar bike tu binvîsî tişte­k e û tu xwe neçar bikî, zorê bidî xwe û pê­nûsa xwe binivîsî tişte­kî din e û gelekî cuda ye.

Bi rastî jî di wêjeyê de çî helbest be çî roman be dema ku bûyera behsa wê tê kirin hatibe ji­yîn gelekî cuda ye ji tiştên ku mirov dibihîze an jî ji xeyalê xwe biafirîne. Tiştê mirov dijî bandoreke mezin li hest û ramanê mirov dike û nivîsa ku tê ji­yîn gelekî cuda û berhemdartin e ji nivîsa ku tê xeyalkirin.

Qêrîna dayikeke kezebşewitî ya ku zarokek xwe dispêre axa sar ne wekî girî û qêrîna gundî, derdor û cîrana ye. Ew dayik tenê bi êşa dilê xwe dizane û ew dengê ku ji gewriya wê derdikeve naşibe dengê giriyê derdora wê.

Di hemû bûyer û serpêhatiyên vê ro­manê de mirov baş hîs dike ku bi rastî ew dîmeneke zindî ye li ber çavên mirov e û wiha xuya dike ku nivîskar ew bûyer bi xwe jiyaye. Lewre jî bandora wî heta bi dawî li mirov dibe. Nivîskar dema behsa zuhabûna lêvên xwe dike û pesnê lêvên yara xwe dide qirka mirov pê re ziwa dibe û wê dilbi­jokiya xweş di hundirê xwe de dijî. Dema nivîskar behsa hevalê xwe yê birîndar dike pê re vizîna wan mêşên li ser xwîna birîna

wî ya xedar tê guhê mirov û wekî ku derziya wan mêşên bi xezeb di canê mirov de radibe.

Di her bûyerekê de bi zimanê xwe yê li­hevhatî û dîmenên bedew xwînerê xwe dibe wê deverê û bi xwe re dide ji­yîn. Xwîner bi kêfa wî şa dibe, bi êşa wî re qirik­tal dibe û pê re di nava bûyerê de dijî.

Wekî min di serî de jî got dema mirov tişte­kî bijî ne wekî wê ye ku mirov bibihîze an jî xeyal bike. Dibêjin ku dengê defê ji dûr ve xweş tê, tevî ku ew bi wateyeke din tê gotin lê tiştê ku ez dixwazim bêjim ev e: Kelecan û hestên ku govendgêr dijî û he­jandina milên wî yên wekî bazekî perê baskên xwe li ezmanê heftan dide ji dûr ve nabe û ew hestekî gelekî cuda ye. Bi gotineke din temaşekirina wê govendê nikare hestên ku govendgêr bi xwe dijî bîne ziman. Dengê defê di nava mejiyê wî de xweştir e û dema kelecana govendgêr zêde dibe ewqasî nêzîkatî jî têra wî nake, guhê xwe dide ser defê.

Bi gotineke din dema ku bûyerek diqewime ew bûyer çiqasî kûr û dûr be, çiqasî bi êş an jî bi kelecan û coş be cud­ahiyek mezin heye di navbera ku tu di nava wê bûyerê de bijî û tu bûyerê ji devereke din bibihîzî. Wekî ku dibêjin yê ku çovan dixwe ne wekî wî ye ku çovan dijmêre.


Her wiha mirov dikare wiha jî bêje; dema ku bûyerek bandoreke mezin li te bike û tu di bin wê bandorê de helbestekê binivîsî an jî romanekê binivîsî gelekî cuda

ye ji rewşa ku tu xwe mecbûr bikî ji bo bûy­erekê binivîsî. Di encamê de berhemên ku di herdu rewşan de derdikevin holê jî gelekî ji hev cuda ne. Yek bi hestekî raste­qîn û bi jana dil hatiye nivisandin û ya din bi hostatiyeke nivîskariyê û bi xeyalekî çêkirî hatiye nivîsîn.

Pirani dema ku mirov berhemekê dixwîne ew yek aşkera xuya dike ku tu çiqasî bi zanebûn û hostatiyeke mezin wê berhemê ava bikî jî heke tu wê bûyerê ne­jiyabî kê­m û bê çêj dimîne.

Bi giştî di vê derbarê de ez dikarim dawiya dawî wiha bibêjim û vê yekê jî lê zêde bikim: Bê guman tenê rastiya jiyana bûyerekê jî têr nake ku bibe berhemeke hêja û bikêrhatî lê hewcedarî bi hostatiya hûnandin û xemilandina hestan jî heye. Hewcedarî bi avakirina dîmen û wêneyên helbestî jî heye . Êdî dema rastiya ji­yîna bûyerê û van alavên din ên hostatiya nivîsê tên ba hev wê gavê berhemeke hêja û mînak derdikeve holê.

Bi rastî jî min ew yek baş hîs kir di xwendina romana Bîlen a bi navê Meşa Jiyanê de. Bê guman bi van çend gotinan min xwest tenê hestên xwe bînim ziman lê bi rastî jî ew berhem hêjayî lêkolîneke berfireh e. Ez li vir dikarim bi dilekî rihet bêjim ku xwînerên vê romanê dê poşman nebin, berevajî wê yekê dê dilê wan li xwendinê vebe û di berhemên din de jî li vê çêj û tama ku di bin zimanê wan de bimîne bigerin.



Qutkirina ava Çemê Firatê

| Navenda Nûçeyan

Tirkiyeyê ji 27’ê çileyê ve ava Çemê Firatê li ser şêniyên Sûriye û Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê qut kiriye. Qutkirina ava çem bandorê li ser ceyrana malan jî dike û ceyran jî her diçe kêmtîbe. Di encamê de li gelek taxên Helebê av û ceyran dem bi dem qut dibin.

Di 10 salên derbasbûna aloziya li ser Sûriyeyê re û piştî ceribandina her rengê gef û êrîşan ji aliyê hêzên cuda ve, vê carê jî Tirkiye ava çemê Firatê wekî gefeke mezin li hemberî gelên herêmê bikar tîne û dixwaze ku zêdeyî 2 milyon mirovî tî û bê ceyran bihêle. Her wiha dixwaze ku deriyê rizqê wan ê bi tenê ango çandiniya wan zuha û bê av bihêle.

Bi kêmbûna ava Firatê re karesateke mezin a mirovî li pêşiya xelkê herêmê ye. Ji niha ve gelek stasyonê ku ava vexwarinê vediguhêzin bajarên wekî Dêrazor, Hesekê, Kobanê, Tebqa û hin deverên din ên ji ber kêmbûna avê, nema dixebitin.

Para Sûriyeyê

Diviyabû ku para Sûriyeyê ya ji ava Firatê di saniyekê de bigihê 500 metrekûpî lê piştî ku hikûmeta tirk pêşiya avê Firatê girtiye ew para Sûriyeyê ya li gorî peymanên ku beriya 30 salan di navbera her du welatan hatibû destnîşankirin de, bînpê dike. Niha li şûna 500 metrekûpî rêjeya avê daketiye di



saniyekê de 200 metrekûpî.

Heta niha ne hikûmeta Sûriyeyê û ne jî saziyên navneteweyî li ser van bînpêkirinên Tirkiyeyê tu daxuyanî nedane û tu tiştek nekirine. Bê guman ev yek bandoreke mezin li Iraqê jî dike lê tu gavên berbiçav di vî warî de ji aliyê hikûmeta Iraqê jî nehatine avêtin.

Şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê têkildarî kêmkirina ava Çemê Firatê bertek nîşan dan.

Bertekên şêniyan

Şêniyê bi navê Omer Fewzî yê ji

taxa Şêx Mexsûdê axivî û wiha got:

“Dewleta tirk bi qutkirina avê li ser gelê Sûriyeyê bi taybet şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê armanc dike ku vîna me bişikîne. Tirkiye di şer de bin dikeve û pişt re jî pey kiryarên bi vî rengî dike. Ava Çemê Firatê qut dike. Em tev dizanin ku îro Tirkiye di hemû komplo û siyaseta xwe ya dagirkeriyê de bin ket.”

Avê weke çekekî bi kar tîne

Omer Fewzî diyar kir ku qutkirina avê kiryareke dijminane ye û ev tişt

anî ziman: “Tirkiye bi rêbazên cuda gelê Sûriyeyê dikuje, herêman dagir dike, vê carê jî avê wekî çekekî li hemberî me bi kar tîne.”

Sedemê qutkirina avê çi ye?

Têkildarî bandorên qutkirina ava çemê Firatê şêniyê bi navê Mihemed Îsa da zanîn ku ev yek bandorê li çandiniyê, avdanê û peydkirina ceyranê jî dike û wiha pê de çû: “Dewleta tirk çi ji me dixwaze. Çima li her deverî dijberiya gelê kurd dike. Çi gunehê me heye ku heta avê li ser me qut dike?”

Bêdengiya civaka navneteweyî

Di berdewama axaftina xwe de Îsa bal kişand ser bêdengiya rêxistinên mirovî û civakên navneteweyî û wiha got. “Çima hûn îro vê neheqiya dewleta Tirkiyeyê nabinin. Bes e êdî zextê li dewleta tirk bikin da ku şerê qirkirinê û kiryarên sûcdar rawestîne.”

Kiryarên derexlaqî

Şêniya bi navê Lîna Mihemed jî sûcên Tirkiyeyê yên li dijî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û qutkirina ava Çemê Firatê şermezar kir û wiha got: “Dewleta tirk dixwaze gelan qir bike. Banga îslamê dike lê di meha Remezanê de ava Çemê Firatê li ser şêniyan qut kir. Ev kiryareke derexlaqî û dermirovî ye.”



Daxwaza Amerîkayê ji Azerbaycanê

Hewldanên Azerbeycanê yên bi alîkariya dewleta tirk a ji bo dagirkirina Ermenistanê didomin.

Amerîkayê bang li Azerbeycanê kir da ku di demek zû de yekîneyên xwe ji sînor vekîşîne.

Şerê di navbera Azerbeycan û Ermenistanê de yê ku di 27’ê îlonê de dest pê kiribû bi piştgiriya Tirkiyeyê beşek ji Qerebaxa Jorîn dagir kiribû. Azerbeycan di rojên dawî de ketiye nava hewldanên dagirkirina hinek axên ku wek ên Ermenistanê tên zanîn.

Li ser vê yekê jî Amerîkayê hişyarî da Azerbeycanê ku hewl dide dagirkeriya xwe bi çend kilometreyan nêzî Gola Sevê bibe.

Ji berdevkên Wezareta Karê Derve ya Amerîkayê Jalîna Porter ji rêveberiya Bakû xwest ku yekîneyên xwe hemû yên li ser sînorê Ermenistanê ‘tavlilê vekîşîne’.

Jalîna Porter a bi rêya telefonê tev li daxuyaniya çapemeniyê bû, diyar kir ku Amerîka tevgera Azerbeycanê ya li herêmê weke ‘bêberpirsyarî, rewşeke neheq û sorkirinê’ îfade dike. Porter anî ziman ku welatê wan ji nêz ve bûyerên li herêmê diqewimin, dişopîne.

WASHINGTON



Parlamentoya Iraqê dicive

Endamê Lijneya Asayîş û Parastinê ya Parlamentoya Iraqê Seran Eacîb li ser civîna parlamentoya Iraqê ya ku tê payîn hefteya bê li ser êrîşên Tirkiyeyê bi awayeke lezginî pêk were axivî.

Seran Eacîb got ku beriya Cejna Remezanê endamên Lijneya Asayîş û Parastinê yên Parlamentoya Iraqê biryar dane ku hefteya bê, parlamento li ser operasyona dewleta tirk a li ser Herêma Kurdistanê, bi awayek lezgîn bicive.

Seran diyar kir ku divê li ser asta Hikûmeta Bexda û Hewlêrê bi rîyên navneteweyî, dijî hêzên artêşa tirk zext dewam bikin. Seran da xuyakirin ku dê Lijneya Asayîş û Parastinê ya Parlamentoya Iraqê dijî destwerdana Tirkiyeyê raneweste.

Li gorî çavdêrên siyasî hinek komên siyasî ji ber ku berjwendiyên wan yên aborî bi Enqereyê re hene, dixwazin civîna parlamentoya Iraqê ya li ser dagirkeriya Tirkiyeyê, asteng bikin.
BEXDA

Hêj cejn nehatiye welatê me



Reyhan Îke

Di van rojan de em zêdetir di kukidên dilê xwe de bi şîrê xwedawendan helbestan dimeyînin ji wan re. Ji ax û avê, nan û baranê, ji ba û bahozan, ji rondikên çavên me, hezkirin û evînên me, ji keserên kûrahiya dilên me, ji çiyayên pişt û pala baweriya me, ji deştên sîng û berê welatê me zêdetir bêhna wan tê van rojan.Wekî dayik û bav, xwişk û bira, yar û dildar pêçekên janêyên di dergûşên dilê me de bê hedartir dibin van rojan. Rondikên me ji baranan zêdetir,keserên me ji deryayan kûrtir, bêriyên me ji şadiyên me pirtir dibin di van rojan de. Di van rojan de xelk diçin geşt û seyranan, em diçin goristanan û wan bi bîr tînin, ji bo xatirê rêza xwe ya ji jiyan û heqîqetê re.

Roja 12’ê nîsanê salvegera şehîdbûna şoreşgera Kurd Leyla Qasim bû. Di keseyatiya Leyla Qasim de, hemû dildarên têkoşîna azadiya Kurdistanê bi rêzdarî bi bîr tînim.

Belê,cejnek din, biharek din jî xatir dixwaze ji me. Rojek din ya dayîkan derbas bû ji 365 rojên salê. Lê her roj û meha salê cardin êşeke zebêdax da dilê dayîkên vê axê. Ji giraniya hemû dem û demsalan zêdetir bû barê keser û bêriyên me. Dilê me bi jana veqetînan cardin derizî, lêvên me bi volqanên kelegirî nelerizîn û rûyê me yê li rojê cardin bi xunav vebûn li berbangan di van rojên cejnê de.

Yekşema hefteya duyem a vê mehê Roja Dayîkan bû. Xelkê bi gul û kulîlkan, bi diyarî û xelatan roja dayîkên xwe pîroz kirin. Di roja beriya cejn û piştî cejnan de heman gotin ji lêvên dayîkên me rijiyar: ‘Kengê azadî li welatê me vegeriya, em gihiştin zarokên xwe, wê rojê ji bo me cejn e.’ Ji ber bêyî azadî li vî welatî hemû jiyan girêkek kor e. Nan û av, xweşî û şadî, hezkirin û evîn, cejn û dîlanên me temenkurt in û li hemû rojên cejnan dasiyên di qirika me re diçin zêdetir dibin.

Em zêdetir bêriya welat, hezkirî, yar û zarokên xwe dikin. Em zêdetir bi êş û janên veqetînan, neyariyan, zordarî û bindestiyan dihesin di rojên cejnan de. Xelk diçin geşt û seyranan, em berê xwe didin goristanan û hezkiriyên xwe yên li goran bi bîr tînin. Ji axa me, ava me, nanê me bêhna wan tê. Bêhna dildarên evîn û azadiyê, şîrhelalên dayîkan û dildarên vê axê yên rast. Di rojên cejnan de bahozên li şewatên me didin dijwtartir in û hestên me belavî çaraliyên welat dibin. Geh bêriyên me dibin lorîkek bijan, geh hêviyên me dibin kenekî ducan, geh li ser zinarek bilind em çelengeke pordirêj bi birînên wê ve hambêz dikin; geh zendên me dibin ber pala egîdekî dilşewat û li ser zimanê welatekê dibe sonda tolhildana rondikên me.

Di van rojên cejnê de, dişewite dar û daristanên welatê me, bêhna barûtê ji ya axê nasyartir e li gel hemû zindiyên warê me. Cardin guleyek li bedena ciwanekê dikeve, evîndarek ji dildarê xwe, keçek ji bavê xwe, kurek ji dayîka

xwe, dayîkek ji kezeba xwe tê veqetandin. Di van rojan de jî em birînên xwe bi lewendiyên hêviyê dipêçin. Dilsozî û hezdariyên me, evîn û evîndariyên me dibin vîna ji pola û em hemû dilê xwe li ser kenên zarokek ber bi pêserojê ve dinêre nexş dikin. Ji derveyî azadiyê ti nûjdar nîne ku bicebirîne birînên dayîkên me.Dibe ku ji zanîna vê heqîqetê be zarokên Kurd li şûna destegulan dest diavêjin çekan, berê xwe didin cengan, hêj di bihara temenê xwe de dilê xwe dikin destegul ji bo daxwaza dayîkan û dikevin hambêza axê, dibin zarokên şîrhelalên dayîka niştîman.

Êşên me yên bi tu cejnan hêmin nabin, bi her cejnê hartir, dijwtartir û xedartir dibin hene. Ji ber hêj cejn nebûne pirên hevghîhnê li gel me û em bi dayîk û bav, ax û welat, yar û dildar veqetînan dijîn û her veqetîn kulmekî din xwê li birînên me wer dike. Nîvçe ne kenên me, şahiyên me, cejn û xweşiyên me. Aliyek me tirs, aliyek me derbederî, aliyek me bindestî, aliyek me kuştin û mirin, aliyekî me zilm û zordarî, birçibûn û hejarî, aliyekî me hêvî û bawerî, hêrs û tolhildan, serhildan û xweragirî...

Dibe ku bi sedan, hezaran pirtûkan jî neyê vegotin ev heqîqeta ku dayîkên me bi çend peyvnan tînin ziman. Di wateya rast de hêj cejn nehatiye her çiqas 15’ê nîsanê Roja Cejna Zimanê Kurdî be jî. Ji ber hêj zimanê me qedexe ye. Ji bo azadiya ziman, rûmet, xak û welat em hêj cangoriyan didin. Hêj em parî û parçe ne, xêrên me li kesî naçin di cejnan de. Ji ber em hêj nebûn xwe. Xayîntî ji nav me xilas ne-

Li Xezayê alozî didome

Navenda Nûçeyan

Di 10 gulanê de komeke filistînî beriya pîrozbahîya cihûyan ya salvegera dagirkirina Qudsê, xwe li Mescîdî El Aq-sayê bi cih kirin. Ev bicîhbûn di navbera Filistîn û Israîlê de bû se-dema destpêkirina aloziyeke mezin. Aloziya ku ji ber vê sedemê derketiye

Êrîşên hewayî yên Israîlê li ser Xezayê bi dijarî didome. Artêşa Israîlê li sînorê Xezayê sewqiyata leşkerî û çekên giran zêdetir dike. Her wiha heta niha ji 100’î jortir kes hatin kuştin

heta niha bi dijarî didome. Êrîşên hewayî yên Israîlê li ser Xezayê bi dijarî berdewam dikin. Her wiha artêşa Israîlê li sînorê Xezayê sewqiyata leşkerî û çekên giran zêdetir dike. Ji roja duşemê heta niha hej-

mara kuştina filistîniyan ji 100’î jortir e. Di nav kuştîyan de bi dehan zarok jî hene. Li Israîlê jî di encama roketên ku ji Xazeyê tên avêtinê de herî kêm 8 kes hatin kuştin. Komên biçek ên filistîniyan jî bajarên Aşkelon, Aşdod û nêzî balafirgeha Ben Gurion a li Tel Avivê dike armanc û bi roketan êrîş dike.

‘Gotina dawî hîn nehatiye gotin’

Serokwezîrê Israîlê têkildarî mijarê daxuyanî da û wiha got: “Min gotibû dê Hamas berdêlên giran bide. Me vê kir û em ê hîn diwartir berdewam bikin. Gotina dawî hîn nehatiye gotin û ev operasyon dê heta cihê pêwîst bidome.”

‘Em ê dersek mezin bidin wan’

Berdevkê leşkerî yê Hamasê jî pe-yamek weşand û wiha got: “Operasyonêke ku li ser Xezayê bê kirin, bi îzna Xwedê, wê derfetekê bide ku em ê hejmara kuştî û mehkûmên dijmîn zêde bikin. Em amade ne ku der-

seke mezin bidin wan.”

Mafê parastina rewşa ya Îsraîlê

Têkildarî aloziya di navbera Filistîn û Israîlê de Berdevkê hikûmeta Almanyayê Steffen Seibert di civîna çapemeniyê de axivî û têkildarî êrîşên roketan ên Hamas ên ji bo Israîlê wiha got: “Êrîşên terorîstî ne û mafê parastina rewşa ya Israîlê heye.”

Amerîka filistîniyan nabîne

Li aliyê din rêveberiya Çînê jî Amerîkayê bi jinedîtina êşên Filistîniyan sûcdar kir. Çîn a ku wê vê mehê serokatiya Konseya Ewlekariya Neteweyên Yekbûyî (NY) bike, di saziya NY’yê de helwesta xwe ya li gel mafê parastina filistîniyan bikar anî.

Berdevkê Karê Derve yê Çînê Haû Chûnyîng jî ev tişt anî ziman: “Amerîka ji bo mafê misilmanan fikarên xwe dubare kir, lê êşên filistîniyan ji nedîtî ve tê. Divê Amerîka bikeve ferqa wê yekê ku mafê jiyanê ya filistîniyan jî bi nirx e.”



Di belavkirina derziya koronayê de newekhevî

Ji destpêka şewba vîrûsa koronayê vir ve heta niha li tevahiya cihanê zêdetirî 3 milyon kes bi koronayê jiyana xwe ji dest dan. Her çiqas ku li gelek deverên cihanê dewletan dest bi aşîkirinê kiribin jî li welatên wek Hindistan û Tirkîyeyê gel nehatiye aşîkirin.

Weke tê zanîn Rêxistina Tendurîstiya Cihanê (WHO) bi boneya aşî bi awayekî wekhev belav bibe komîsyoneke bi navê Covaxê di nav xwe de ava kiribûn. Bi vê komîsyonê hewl dan ku dozên aşiyê bigihînin welatên wek Afrîka, Hindistanê û hwd. Lê belê em dikarin bêjin ku tu bandora vê komîsyonê negihîştîye welatên wek Hindistan, Afrîka û rojavaye Kurdistanê.

Komîsyona WHO’yê

Herî dawiyê WHO’yê komîsyonek din ji bo sedemên belavbûyîna koronayê ava kirin. Komîsyonê di rapora xwe ya amadekirî de hem bal kişand ser kêmasiyên WHO’yê hem jî kêmasiyên hikûmetan û wiha got: “Li gor daneyên raporê WHO’yê û hikûmetan xebatên baştir pêk bianiya dê rewş nehata vê astê.”

Kêmasiyên hikûmetan û WHO’yê

Li gor komîsyonê bi gelemperî polîtîkayên hikûmetan û polîtîkayên WHO’yê de şaşî hene û hewceye ku WHO’yê di serî de ‘rewşa awarte ya kurewî’ îlan bikira û her wiha ger dewlet rewşên xwe sererast nekin dê mirovahî bi şewbeyên girantir re rû bi rû bimînin. Dîsa di raporê de hat diyarkirin ku di nav welatên dewlemend û xizan de jî newekheviyek mezin heye û ji bo kontrolkirina tedbirên dewletan pêdivî bi konseyeke kurewî heye.

Rewş bi aşiyê jî sererast nebû


Li gor daneyên aşîkirin û tedbiran zanyar diyar dikin ku dê dibe sala du-yemîn a coronayê ji sala pêşî xiraptir bibe.

Li Amerîka û Ewropayê hikûmet bi tedbiran niha ber bi rewşa normalbûyînê ve diçin, lê li welatên wek Hindistanê rewş her diçe xirabtir dibe. Hindistan ji alî aşîkirin û nexweşxaneyan ve kêmasiyeke mezin dijî. Li welatên Afrîkayê hêj aşîkirin qet dest pê nekirîye. Hewceye ku dewletên din

alîkariyê bidin van dewletan.

Soza xwe neanîn cih

WHO ku divê derziya dijî Covîd-19 bi rengekî wekhev li tevahiya Sûriyeyê belav bike lê ewilî dozên aşiyê li herêmen ku ji aliyê Tirkîyeyê ve hatine dagirkirin, li çeteyan belav dike. Aşkera bû ku WHO’yê soza ji bo derziyê daye Rêveberiya Xweser jî bi cih neaniye.



Daxuyaniya MSF’ê

Rêxistina Doktorên Sînornenas (MSF) ku navenda xwe li bajarê Cenevre yê Swîsreyê ye jî WHO rexne kir, ji ber ku derziyan li gelek herêman bi taybetî jî li Sûriyeyê bi rengekî wekhev belav nake. MSF’ê diyar kir ku ji daxuyanî û hejmarên fermî gelekî zêdetir, mirov nikarin derzî û testan bi dest bixin.

‘Ji bo operasyon têk biçe divê yekitî çê bibe’

Operasyona Tirkîyeyê ya li dersînor ji 23’yê nîsanê ve didome. Tirkîye bi alîkariya hêzên navneteweyî û bi alîkariya hikûmeta Başûr, axa Kurdistanê dagir dike. Her çiqas li hundir û derveyî welat gel û saziyên kurdan li dijî vê operasyonê derkevin jî bi dengekî bilind heta niha ji hikûmeta başûrê Kurdistanê tu bertek nehatiye nîşandan.

Têkildarî êrîşên Tirkîyeyê cîgirê sekreterê Partiya Yekitiya Demokrat a Kurd a li Sûriyeyê (PYDKS) Mistefa Meşayix axivî. Meşayix diyar kir ku her çiqas gelê kurd hewl dide di aliyê dîplomatîk de bikeve nav tevgerê,

anku dema wekî şande bixwaze serdana dewleteke din bike, Tirkîye ji bo pêşîlêgirtinê bi heman dewletê re têkiliyên xwe xurt dike û wiha got: “Bi vî rengî rê nade ku gelê kurd sûdê wergire. Me bi xwe jî ev yek jiya. Dema ku ji bo çareserkirina pîrsgirêka Sûriyeyê, her wiha ji bo erêkirina li ser Rêveberiya Xweser me dît dewleta tirk ji bo gelê kurd sûd wernegire çawa destwerdanan kir.”

Mebesta Tirkîyeyê

Meşayix da zanîn ku mebesta Tirkîyeyê jî êrîşan, tune kirina gelê kurd û guhertina demografyayê ye û wiha pê

de çû: “Hetanî vê rojê ev siyaseta dawam dikin, gihîştîye asta ku ava Çemê Firatê li ser gel qut bike. Bi qutkirina avê dixwaze bandorê li çandinî û sewalkariya li herêma bike û pê re milet jî penaber bike.”

Bi kar anîna çekên kîmyewî

Di axaftina xwe de Meşayix bal kişand ser êrîşên dewleta tirk a li ser Başûr û diyar kir ku armanca êrîşan valakirina herêma ye û mayîndekirina hebûna xwe ye.

Meşayix diyar kir ku dewleta tirk dema di êrîşên xwe de têk diçe çekên kîmyewî bi kar tîne û wiha domand:

“Diyar dibe armanca Tirkîyeyê tune kirina hebûna kurdan e. Her wiha dixwaze xwe bigihîne xeyala pêkanîna Mîsaqî Milliyê.”

Nebûna yekitiya kurd

Mistefa Meşayix da zanîn ku sedema ranewestandina êrîş û kiryarên Tirkîyeyê, ji neyekbûna gelê kurd pêk tê û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Heke yekitiyeke neteweyî ya kurdî neyê avakirin, dê kiryarên dewleta tirk bidomin. Her kes dizane êrîşa li ser başûr û rojavayê Kurdistanê, tê wateya ku dewleta tirk avakirina rêveberîyeke kurdî red dike.”

Mîrateya Demokrasiyê

Abdullah Îdîg


Hemû têgîn û teoriyên di zanistên civakî de tên zanîn, di dîrokê de teqez kevnepîyeke wê ya dîrokî û civakî heye. Ev kevnepî, dema ku li ser rastiyan civakê tê vegotin heqîqet jî derdikeve holê. Nexasim, zanistên civakî û hemû têgîn û teorî dema ku wekî zanistên determinîst an jî pozîtîvîst bêne vegotin bê guman wê heqîqeta civakî û dîrokî bê berovajîkirin. Çiqasî fikir, raman, têgîn û teorî hebin, tişta ku cewheriya van zanistan vebêje heqîqeta dîrokî û civakî ye. Pergala kapitalîst jî ji bo ku wê heqîqetê reş bike gelek amûrên bêexlaqî bikar anî û bikar tîne.

Dema ku raman û têgîna Demokrasiyê bê destgirtin - mîna ku li jor hatiye behskirin - divê girêdana wê ya dîrokî û civakî bi nirxandinên girîng re bê vegotin. Demokrasi; wekî têgîn di dîrokê de yekemîn komên ku mirovan avakirine pêwîst e bê lêkolînkirin. Ev komên yekemîn, xwe wekî qlan, qebîle û komên eşîran rêxistin kirine û tişta herî girîng jî ji sedî 98 ji dîroka civakê pêk tê. Ev pêkhatîna ji sedî 98’an rastiya demokrasiyê dide berçavan. Ev kom, xwe li ser cewheriya demokrasiyê didin rêxistinkirin û pîrsgirêk û nîqaşên di nava wan de diqewimin di nava meclîsên komunal de çareser dibin. Ev nêzîkatiyeke demokratîkbûnê ye. Lê belê zanistên pozîtîvîst rastiya vê mîrateya demokratîk berovajî dike û ji heqîqetê dûr dixê.

Mîrateya Demokrasiyê, dema ku wekî gotin û vegotinên rojane bê destgirtin helbet rastiya wê ya civakî û dîrokî nayê nasîn. Di vê çarçoveyê de helbet wê zanistên pozîtîvîst vê mîrateya qedirbilind înkâr bike û wê pergala desthilatdarî û dewletî jî wekî heqîqeta dîrokî û civakî vebêje. Tişta ku neyê qebûlkirin ev nêzîkatî ye û qlan, qebîle û komên eşîran cewhera dîroka mirovahiyê û demokrasiyê ye.

Ev pênc hezar salên ku li pişt me maye bi şerê demokrasî û dewletê re derbas bûye. Dem hatiye carna şer kirine û dem hatiye jî di nava xwe de li hev kirine. Pergala dewletî heta qirna 21’ê xwe wekî kevnepîyeyên hiyerarşîk, koledarî, feodal û kapîtalîst vesaz kirîye. Dem hatiye cewhera demokratîk hatiye înkarkirin û dem hatiye jî ev mîrate nexasim, kevnepîya demokrasiyê jî helbet li hemberî vê pergala dewletî û desthilatdarî bi berxwedanên çandî, olî û civakî; wekî qebîle û komên eşîran; berxwedana bajarên konfederalîzmên demokratîk, kevnepîya feylezofan, dêr, dergeh, terîqet û mezheban li ber xwe dan. Dîsa ji bo raman û zanistên azad berxwedana jinên zanyar di mîrateya demokrasiyê de cihê xwe girtiye. Li hemberî hemû êrîş û şerê bîrdozî yên pergala desthilatdar û dewletî mîrateya demokrasiyê heya vê rojê berdêlên gelek giran da û niha jî ev mîrate xwe di nava têkoşîna Tevgera Azadiya Kurd de diparêze.

Bê guman, vê mîrateyê bi taybetî têkoşîna xwe ya herî zêde li hemberî pergala kapîtalîst û netew-dewletê da û dide. Di van sedsalên dawî de ev şer gurtir bûye û îro jî Tevgera Azadiya Kurd li hemberî vê pergala dagirker bi mîrateya demokratîk têkoşîneke bêhempa dimeşîne. Tevgera Azadiya Kurd, bi mîrateya femînîst, sosyalîzma reel, anarşîst û ekolojîya civakî têdikoşe û hebûna xwe didomîne. Mîrateya Tevgera Azadiya Kurd jî, li hemberî modernîteya kapîtalîst modernîteya demokratîk, li hemberî netew-dewletê netewa demokratîk û li hemberî burokraşiya pergala netew-dewlet bi konfederalîzma demokratîk (meclîsên gel, meclîsên taxa, akademî, komun û kooperatîf) çand û mîrateya demokrasiyê bextewartir dike.



Ji Delav

Feratê Dengizî

Me zarokan li Darka Zava bi xaran di- list, kêf û coşa me, çêr û şerê me der- dor di qîrê de dihişt. Darka Zava ciyê civata mihelê û ciyê listika çîrê, hêk û xaran bû, ser tahteke rast lê kort û mort bû, em du û du bûbûn heval, me rêza qurîşkan rast kir, ê serek listik da destpêkirin, piştî çend xaravêtinan dor hat ser min. Min xwe li ber xarê xweş kir; ez xweş dizanim li xarên kortê bixim, wiha ji jor wexta dibê “peleq” li orta xara hevalê min dikeve, kêfa min zêde tê û devê min diçe ber guhê min, şikrîko jî dizane lê li ser piştê diqulupe, kenê guran pê ve ye, min tiliya dirêj da bin a şehadetê li binê xara xwe ya Dêrîşî ediland, ax û bixurkên ber da alî, dûrayî pîva, da xwe ku xarê bilind kim, yekî hişk bi guhê min girt.

Ez sar bûm.

Bavê min di hepsê de ye, apê min tişteki wiha nake, kesekî ku bikaribe guhê min wiha zeft bike û bike ku ji binî ve rabike nînbû.

Devê min tije çêr li xwe zivîrîm.

Yekî direj î xurt, zilamekî mîna hir- çekî siya wî ketibû ser min, min xwest xwe ji destê wî xelas bikim, na nika- rim. Hê wisa min hew dît ku tu zarok li dora me nemane. Hela, hela... pê de, pê de ber çavên min rohnî bû, hey lo, ev mielimê gund Ali Fuat Tek ê mêr- sînî ye. Dîsa min li ber xwe da, guhê min berda, lê milê min zeft kir û berê min da mala me.

Kalikê min bi acizî, bi zimanê wan (ez ê paş ê fêhm bikim) bi şer çû ser;

•*Hûn çî ji me dixwazin, em zaro- kê n xwe naşînin mekteba we.*

Hişê kalikê min ji yê her kesî cuda- tir bû, ji dewletê qet hez nedikir, de ka bila ev mijar bimîne.

Lê bi ya wî jî nebû, bi ya min jî. Êvarê “bekçî” hat, tiştin ji kalo re gotin.

Tiştê ku min dawiyê fêhm kir, her zarokên 7 salî divê herin mektebê, yan na piştî 3 rojan wê ceza ji wan re bê û dikarin bavê wan têxin hepsê, yê min jixwe di hepsê de bû! Dê cezayê wî zêde bibûna, lê aqilê min tiştên wiha ranedigirt; *“ez naçim mektebê”*.

Kurapê min roja dinê hat, bi des- tên min girt û bi zorê bêdilî min û ka- likê min, ji bo ku em ceza nexwin, ez dam kêleka xwe, ku ew jî ev du sal in diçe mektebe, ez birim. Avahiyeke ku naşibe yên me, ser xanî yanî banî bi tiştên sor î xwar, bi qozikeke wek piшта masî rêsayî, binê odeya ku em ketinê texte, yên rast î xweşik, dîwar dişibin ên me, spî, sîqalkirî, lê gizrek destên mirov diêşand, bi qasî bejna min çarhawir bi rengekî şîn boyaxkirî. Tiştin ku ji wan re digotin *“sira”* bi rû- nişteke û mase, her dudu-sisê li kêleka hev rûdiniştin, textekî reş raserî zaro- kê n ku li wan *“sira”yan* rûniştine. Lî dîwêr hin resm...

Bêhneke xerîb a ecêb ji hundirê odeyê, ji hundirê mektebê dihat. Wek bêhna benîşt, a berûyan; lê na ne berû, bêhnek xweş, lê ji min re xweş nehat, nizanim çîma!

Ez wek xerîbekî ku ketibe dinya- yeke din, werê ecêb, lewra em ji me- tebe direviyan, nedihatîn nêzikî wê jî lê va ye ez bi zorê xistim hundirê wê!

Paşê zengilekî lê xist, em gişt ketin wê odeyê, ez li teniшта kurapê xwe me. Kurap nirquçand min, em gişt rabûn ser lingan, wî tişteke got, qere- balixê jî wek wî lê zêde kir. Em rûniş- tin, lê ez gêj im, tişteki fehm nakim. Wek ku di çaleke bêbinî de, di binê

Hê jî di dilê min de li hember çamê û bêhna wê pêşdarazî heye û çam bê sûc be jî. Lê va wiha ye, lewra bêhna qajê, bêhna çamê ji min re Bêhna bindestiyê, ya mektebê, bêhna mêtîngeriyê ye. Her çiqaşî ji qelemzirîçan hez dikim jî ew bêhna çamê bi min nadin efûkirin. Bêhna serdest û zilmê ne ya efûyê ye. Mêtîngerî nayê efûkirin û behna mêtîngeriyê her û her genî ye



hezazekê de bim. Min kir nekir min îdare nekir, li ser kurap zivîrîm, *“mîza min tê!”* wî tiliya xwe rakir, tişteke got, paşê kurap ji min re got, *“her li tewa- letê bimîz û car din wer. Wexta tu hatî li derî bid, paşê wer!”* îca *“tewalet çî ye?”* çûm derve, dareke guhijan raserî pacên mektebê hebû, min li wira li pê çavên her kesî mîst, dengê kenê wan dihat min. Wek birûskê tişteke hat hişê min û min berê xwe da Stewrê û lingo bi qurban, wek bayê bezê dibeziyam, difiriyam. Bê molet min heşt-neh km. qedand û xwe avêt hewşa hepsa Stewrê. Navbera bavê min û derdorê xweş bû, xwedî xatîr bû, di nav siya- set-ticaretê de bû, zilamekî aqilmend, jîr î qedîrnas, zane û xwedî giranî bû, ku te bigota *“Şikriyê Hecî Izêrê Den- gîzî”* hema bibêje av disekinî, giregirên Stewrê yên Erebe û azbetên derdorê yên Kurdan jê hez dikirin, gardiyanan wê gavê ez xistim hepsê cem bavê min, min qawîş û rewşa vira berê jî di- zanibû. Çendik û çend caran hatibûm hepsê cem bavê xwe di vî emrê biçûk î wek sedsalan de, ev cara dehan an nehan bû, nizanim ku dikeve hepsê. Bi qazocaxî xwarin û çay çêkirin, dan min, bêhna min hebekî hat ber min, hatim ser xwe û bavê min pirsî;

•*Derdê te çî ye?*
Nizanim çî, çawa bibêjim.
Hêsir ji çavên min teqîyan, nizanim çiqaşî domand.
•*Îja ev çî ye!*
•*Ez naxwazim herim mektebê...*
•*Ev ji ku derket.*

Min çîroka xwe ji serî heta binî, bê bêhnvedan, xist rêzê.

Sê rojan di hepsê de li cem bavê xwe û ap û mirovê xwe mam, ji ber xwîniya gund, me û mehla jor hevûdu kuştibû di hepsê de bûn, li ser ranzayê

raketim, bi wan re ketim nav peyvan, xwarin xwar, derketim hevdiînê, rewşa wan raçav kir û wî gelek tişt ji min re got, destên xwe di serê min dida û peyv dixistin rêzê;

•Beroxê min xwendin baş e. Divê tu herî mektebê. Gelek tiştan bielimî, bibî hakim-sawcî-ebuqat ku ji van teş- qeleyan, ruşwet û hepsan me xelas bikî. Tişteke ji xara û ber karikan der- nayê. Ka li halê me binêre, ma em jî însan in! Ku xwendeyekî me hebûna... ax ku xwendeyekî me hebûna..!

Temam...
Beroxikê min wê bixwîne, bibe zila- mekî mezin! Hadê rast berê xwe bide mektebê, êdî tu mekteblî yî..! Ku kesî te aciz kir wer ji bavê xwe re bibêje...

Ez serê we neêşînim. Min bi wî serê şîretdagirtî berê xwe da malê, rast çûm Darka Zava, nav listika xaran, dîsa mielim bi guhê min girt;

•*Nêrdesin ulan kaç gundur? (ev çend rojên tu li ku yî, kuro?)*
•*Sawir de, hepis, ba baba..! (Xwe- dêgiravî min gotiye ‘li hepsê li Stewrê li ba bavê xwe me’)*
•*Ne zaman? (Kengî?)*
•*Hema bû zeman! (Ji ber ku niza- nim çî got, min jî li gor peyva wî got, ‘a niha!’)*

Bû tiqetîqa derdorê û bernavkê min ma *“hema bû zeman!”*

Min da ber hev ku wisa nabe.
Bermelê ne kar e, zarokên ku diçûn qal dikirin, pêkenokî, bêencamî! Mekteb zor e, lê encam, nesîhetên bavê...! Jixwe bavê min digot, *“ber- melê û mekteb bi hev re nabe, wê hişê te tevlihev bibe, ya rast mekteb, gira- niya xwe bide xwendina mektebê, ku tu mezin bûyî bielim qur’anê, ve ez di hepsê de elimîm xwendina Qur’anê...”*
Min xwe li mekteb û xwendinê qît

kir, li gel lêxistin, şkence û zehmetiyan ez di mektebê de bûm kesê yekemîn. Sal herikîn. Ibrahim Tok hat dewsa Ali Fuat, ew jî çû Hikmet Sari (*marîtko, me bernavkê wî kiribû ‘marîtko’*) hat dewsê. Ez di mektebê û navçeya Stewrê û gundan de li ser zimana me..! Di sala sêyemîn de Marîtko polên 1-2-3 teslîmî min kir, min ji wan re mielimtî dikir. Jixwe em giş di po- lekê de, bi pirpolî me dixwend... Lê xa- lekê hişê min serobino kiriye û bersiva wê jî kes nizane, ji kê dipirsim, dibêijn, *“de here dîno, aqlê xwe bi tiştên wisa re nebetilîne, ev ne karê te ye!”* pirsgi- rêk ev e; bermelê, qur’an bi erebî ye û axretê xelas dike. Baş e. Mekteb bi tirkî ye û dinyayê xelas dike, tu dibî xwedî pişe. Baş e. Lê kurdî, kurmancî, ev ma li ku...! Ev zimanê şêrîn û nas- name ka em çî ne...!

Ev pirs dê jiyana min serobino bike û ez ê biherikim nav rûbareke dinê. Meseleyek dûr û direj..!

Ka bila ev jî bimîne!
Bavê min ji hepsê derketiye. Bû- yera 27 Gulanê (27 Mayıs 1960, CHP îktîdar e- Em wek malbat û mehele CHP’yî ne) muxtarî çêbûye. Navbera bavê min û Marîtko baş e û bi dizî di binhişê min de ne ebuqatî-sawcî-ha- kimtî cî digire, na *“ez ê bibim, mielim, ez ê bibim mamoste û xelkê xwe hinî zanyariyê bikim. Ebûqat nizam çî kedx- war in. Bi rastî jî bûm mamoste...”* Pê- vajoyeke dûvdirêj e ev mijar... Min pirtûkên mektebê tev xwendine. *“Di bin Behrê de 20 hezar Fersah (Deniz- ler Altında 20 bin Fersah-Jules Verne)”* hişê min dagir kiriye, î’lm, zanist, tek- nîk lazim e!

Em di pola sisêyan de ne. Zivistan e. Wek her tim mielim-Marîtko roja şemiyê nivrokî beriya ku em belav

bibin, got, heta duşemê her kes wê barek êzing bîne ji bona mektebe!

Bû duşem, min êzing ji mektebê re neanî, jixwe êzingên me tune bûn, odeya me ya gund û her kes dihatê û wan êzing ji me re dianî. Bi ser de ez kurê muxtar im, jêhatî me, ma ez û êzing! Wele ez û sê kurikên dinê suc- dar in, cezayê me heta êvarî bodrim e, bê nan û av.

Ji ber ku me êzing neanî ne.

Bodrim bin polê bû, mirov rûniştî tê hilnedihat, me xwe dirêj dikir, tarî, hew me çavên hev didît. Bizmar di piшта me re diçûn û ew bêhna nîvx- weşî mirdar pir zêde ye. Em zarok dîsa bi henek û coş in. Baş e ku ders tune, lê vê derê jî, ya star! Ji bo hew- cedariyên zarûrî em derdiketin û dîsa vedigeriyan hepsa xwe. Nava rojê ku ez neçûm mal, bavê min bi ser mek- tebê de girt û wî û marîtko tiştên ne- mayê anîn serê hev. Marîtko digot, *“tu muxtarî, divê tu bibî mînak”* Bavê min digot, *“em ne mecbûr in ku êzinga ji te re binin, bila dewlet bide. Çi heqê te li van zarokan e, eyb e, ma ev hal e”* û hwd...

Welhasil germiya navbera wan he- bekî sar bû.

Lê yê min tişteki din di serî, mejî, dil û ruhê min de rûnişt. Min pirsî ew bêhna mektebê û ya bodrimê bêhna çî ye? Gotin ew text ji darê çamê (qaj) ne, ev bêhna çamê ye. Malên me tije spî û kêç bûn ên mektebê *“texte ku- rusî”* wey, dar û textên me û kêçên me jî nedîşibîyan hev, her wiha avayî jî. Darên qajan li welatê me tune bûn, ên me darên berû, çiya tev berû, mazî, guhîj, sinc, ijik qizwan, behîv, hevr, bî û benav bûn. Em bi her awayî nedîşî- biyan hev; çîma ew serdest, em bin- dest, çî karê wan li welatê me heye û qanûn jî alîkarê wan bû. Pirs zêde dibûn û xeternak bûn.

Dê jiyanê gelek tiştên dinê jî hînî min bikira, ew ê gelek tişt derketana pêşiya min.

Lê va ji zarokiyê wiha dest pê kir.
Hê jî di dilê min de li hemberî çamê û bêhna wê pêşdarazî heye, wek xwezaiiya ruhê xwe ez ji çamê û bêhna wê hez nakim, tişteki ne nor- mal û çam bê sûc be jî. Lê va wiha ye, lewra Bêhna qajê, Bêhna çamê ji min re bêhna bindestiyê (bodrim!), ya mektebê, bêhna mêtîngeriyê ye. Her çiqaşî paşê ew ê bêhna qelemzirîç (kurşun kalem-Lion) jî wek ya çamê be û di navbera me de ew ê evînek ve- şartî ya platonî çê bibe jî; her çiqaş ez ji pênûs, her curê pênûs û ilim jî ji qe- lemzirîçan hez dikim jî ew bêhna çamê bi min nadin efûkirin.

Bêhna serdest û zilmê ne ya efûyê ye.

Bêhna çamê, ya Qelemzirîçan; textên mektebê, kursî, mase, banî, paşê bêhna daîreyên dewletê, ya qe- reqolan, ya hewş û derdora wan. Tex- tên çam.

Behna çamê, ya qeleman tev hişê min dagir kirine, wek ku ez êzingan bi- peşikînim dixwazim bi saya qelemzirî- çan efûyê derxim, lê na, nabe. Derasayî be jî va wisa ye!

Mêtîngerî nayê efûkirin û bêhna mêtîngeriyê her û her genî ye.

Bila çam, bila ew qajên narînî xwe- şîk î bêhnxweş, nexşên warên evînî li qusûrê nenêrin. Belkî bi xwezayî bê sûc û bê qusûr bin, lê na, rewş ev e! Bila qelemzirîç jî biborin. Û li Heftanîne şer e, ez bêdeng û li her derê bêdengî!

Ma bi estanikan mexepenê

Helîn Uzel

Heme domanî estanikan reyde pîlî benê. Estanikî, behskerdişê qewimî-yayîşanê raşt, nizdiyê raştiye ya zî mîtolojî yê. Bi awayêko kilm û bi vengeko weş yenê vatiş. Estanikî nifşan ra derbasê nifşan benê û heme estanikan de bale ancîyeno qewim-yayîşêk ya zî rewşeke ser o. Estanikî her netew û çandî de estê. Her çandêk de bi awayêko cîyayî yenê vatiş. Çand senîn bibo, estanikî zî goreyê aye ameyê afirnayene. La tay estanikî estê ke hetê dewletan ra seba empozekerdişê rolan ro civatî yenê bi kar ardene. Çend estanikê klasîkî estê. Nînan ra yew zî estanika ‘Sîndîrella’ ya. Estanike de Sîndîrella key-nayêka ke wayanê xo ey nêhelalan ra zilm veynena ya. Na keyneke dima

ra zî hetê prensêk ra yena hezkerdiş û no prens Sîndîrella zilmî ra qaşo xelisneno.

Estanikêy zêy Sîndîrella, esasê xo de ‘perwerdeyo’ ke pergala dewlet-perest vetê orte yê. Pergala dewlet-pereste seba ke rolê civatî ke înan verî ra destnîşan kerdê bidê qebûl-kerdene, xeylê rayîr û raybazan bi kar ana. Rayîrê bintgeyîne zî perwerdekerdişê domanan o. Çimkî doman ameyîya civatan ê. Amûrê ke baş bikar anê ra yew zî estanike yê. Di çarçaweya diyarkerdişê rolê civatî de, estanikî bi goreyê zihnîyetê pergala dewletpereste ameyê avervistiş. Nê zihnîyetî, seba ke zaneno heke cenîy bibê yew zafêrî bi hêz benê, cenîyan verva yewbînan danê bikarardiş. Bi naye wazenê hêza cenîyan bişiknê û pergala xo bidê domnayîş.

Nê kayî reya newîye nîyê û 5 hezarî serrî yê dewam kenê. Domantiya ma ra, rolê ma dîyar kenê. Seba ke ma bi nêy estanikan reyde pîl benê, ma vanê qey raştî û heqîqetê ma zî wina yo. Çimkî estanikan û filmanê domanan de ma veynenê ke her tim cenîyêka zilm veynena û camêrdêko qehremanî keno estê. Ma vanê qey xelasiya ma di destê camêrdan de ya. Camêrdî zêy hêz û cenîye zî, zêy bêhêz, xemgîn, hesûd ‘cenîya xirabe’ danê nawitiş. Raştî wina nîya. Seba ke ma raştîya xo ra dûrî pîl benê, wina zaf şîddet zêdîyeno. La vûrnayîşê na yew di destê ma de yo.

Seba ke no zihnîyet bivûrîyo, heme dinya de cenîyî têkoşîn danê. Her hetê cûwîyeyî de ma eşkenê verva nêy zihnîyetî têkoşîn bidê. Mînak; ma domananê xo reyde, do-

mantîya înan ra dest pê bikerê. Bi estanikanê pergala dewletpereste nê, bi estanikanê ke heqê cenîyan, ekolojî û merdimayî pawenê reyde domananê xo pîlî bikerê. Dûrî ferasetê cinsîyetperestî perwerde bikerê û bale biancê erjanê civatî ser o. Estanikî eşkenê na çarçawe de bêrê vatiş û bikarardiş. Seba ke nêy bêrê pêkardene zî, gere merdim tarîxê cenîyan û çanda xo baş bizano. Zaf muhîm o ke ma serre de xo perwerde bikerê û aver biberê. Ma lêkolîn bikerê û raştî baş analîz bikerê. Raştîya cinîyan çîyo û civatêka demokratîke senîn a? Çareserî û xelasiya merdiman ya pergala kapîtalîste senîn ê? Badê ke ma xo û domananê xo bi goreyê bingeya civata demokratîke perwerde kerd, ma eşkenê zûran ra bixelîsiye û civatêk azade awan bikerê.



‘Pawitiş berpirsîyarîya ma pêronan o’



Hemserekê Komeleya Cigêrayîşê Kultur û Zîwanî ya Mezopotamya (MED-DER) Rifat Ronî 26ê nîsane de pê îdîaya 'propagandaya rêxistine' endam û îdarekerê HDPyî zî tede tewrê 12 siyasetmedaran çarçeweya operasyonê qirkerdişê siyasî de ameybî destbendkerdene. Ronî pê telefon keyeyê xo reyde pêvînayîş pê ard û derheqê 15ê Gulane Roşanê Zîwanê Kurdî de mesaje şîrawit.

Ronî qiseykerdişê xo de da zanayene ke binge-yê 15ê Gulane, weşanayîşê Kovara Hawarî reyde ame eştene û tarîxê 15ê Gulana 1932î de bi tîpanê Latînî hetê Celadet Elî Bedirxan û embazanê ci

ame weşanayene. Ronî wina dewam kerd: “Hûmara yewine ya kovare de wina yeno vatene ‘Haware vengê zanayîşî ya, zanist xo nasîn o, xo nasîn zî do rayîrê xelisnayîşî ma rê akero.’ Ê ke xelisnayîş pê biyarê, eşkenê xo bizanî. Hawar piştî da averşîyayîşê zîwanî.”

Ronî tewr peynî bale ant nasname û zîwanê kurdî ser o û wina qedêna: “Zîwan eynî wext de yeno manaya statuya siyasî ya şarê kurdî zî. Kurdî semedê kurdan welatperwerî yo. Zîwan ma ra mîras maneno domananê ma rê. Pawitişê no mîrasî berpirsîyarîya ma pêronan o. 15ê Gulane Roşanê Zîwanê Kurdî bim-barek bo.” **AMED**

Şewatê daristanê Xozatî dewam keno

Qezaya Xozatî ya Dêrsimî de 9ê gulane de mewkîya Amutka de operasyonê leşkerî dîya destpêkerdene. Leşkeranê tirkî daristan de şewat vet. Şeş rojî yo ke semedê hewnakerdişê şewatî mudaxaleyêk nîno kerdene.

Seba ke vera şewatî nêrazîbîyayîşî zêdîyenê Mudirîya Pêroyî ya Daristanî xeberê şewatî red kerdî. Walîtiya Dêrsimî vizêr bi eşkerayîyêke îdîa kerd ke şewat

çîn o la şewat bi rojan o dewam keno.

Rojnamegerê ke şîyî herêma ke tede şewat esto, medyaya sanalî ra da pêhesnayene ke şewatê daristanî dewam keno. Rojnameger Yaşar Sezgîno ke herêma de ciwîyeno vat rixmo ke hende rêxistinanê komekê sîvilî û xoza semedê hewnakerdişê şewatî veng da, şewat hema zî dewam keno.

DÊRSIM



Tabêlayê siqaqan de beyreqa tirkî

Bêtehamulîya qeyûman a vera kurdî dewam kena. Rojanê verênan de qeyûmê Şaredarîya Bajarê Girdî ya Amedî çarçaweya kampanyaya Sîstemê Adresî û Mekanî (MAKS) de tabelayê siqaqan ke sero de sembolê beyreqa tirke esto daliqna xeylê cayan. Kampanya çoleyê 2021î de merkez û 17 qezayî zî tede xeylê cayan de dabî destpêkerdene. Tabêlayê ke tay cayan de daliqîyayî dêsan sero û tay cayan de zî sey dîrek daliqîyayî erdî sero de sembolê beyreqa tirkî bale ancena. **AMED**



Mersîn de hêrişê nîjadperestan

Keyeyêko kurdo ke şaristanê Hewlêrî yê Başûrê Kurdistanî ra ame Mersînî herêma Gozsuzce Sirtlanî ya qezaya Bozyaziyî de bi hedefê hêrişê 3 nîjadperestan ê tirkan. Hêrişkeran pê îşaretê ulkucîyan hêrişê keyeyî kerd. Netîceya hêrişî de 2 kesî birîndar bîyî û wedarîyayî nêweşxane. Dîmenê hêrişî medyaya dijî-tale ser o ameyî vilakerdene. Dîmenan de dîyeno ke birîndaran ra yew xo ra şîyo û mîyanê gonîye de erdî ser o dergkerde yo. Vengêkî zî vera vano 'Camêrd kişîya.' **MERSÎN**



WHOyî sozê 90 hezar derzînan dabî

Rêxistina Weşîye ya Dinya (WHO) seba derzînanê vîrusê Korona pê nameyê Xîretê COVAXî dest pê kampanyayêke kerdbî. Kampanya bi taybetî seba herêmanê şerî dîyabî destpêkerdene. WHOyî na çarçewe de soz da Îdareyê Xoserî ke heta menga gulane 90 hezar derzînan bîrşawo. Îdareyê Xoserî zî planê xo kerd ke nê derzînan destpêk de piro bido merdîmanê kokîman û xebatkarên weşîye. Labelê goreyê zanayîşan heta nika tay derzînî resayî herêmanê Îdareyê Xoserî. Goreyê agahîyanê ke Îdareyê Xoserî dayî ajansanê miyanneteweyîyan heta nika nêzdîyê 700 derzînî erşawîyayî la pêro zî nêweşxaneyêkê Qamişloyî rê erşawîyayî ke no nêweşxane pabesteyê rejîmê Şamî yo. **CENEV**



Dildarê Amedê

Kovîd 19 û peykerên qeyûm

Gavên hikûmetê yên qaşo li dijî Koronayê yek ji yekê sosrettir e. Jixwe ew ji bo hemû tiştên kurdan û bi taybetî ji bo nixên kurdan gotina (sozde) qaşo di ser û binê gotinên xwe de bikar tînin. Lê di rastiya xwe de ji demokrasiya wan bigire heta bi biratî û wekhevî û azadiya ku behs dikin tev sozde û qaşo ne.

Hikûmetê gelek gavên sosret avêtin û ez behsa hinekan ji wan bikim. Behsa bi 100 milyon derzî dihate kirin lê heta niha derziyên ku gihane vî welatî gelekî kêmî wan hejmaran e ku behsa wê dikirin.

Sûk û bazar û dikan girtin lê xelk li derve ne, ma mîrata koronayê ji dikanan belav dibe yan ji xelkê? Esnafên ku ji ber rewşa vê nexweşiyê û krîza aboriyê qirîk li wan zuha bibû û li hêviya cejna remezanê bûn da ku hinekî qirika wan şil bibe. Lê ew jî bi biryareke ji nişkê ve deriyê dikanên wan hatin girtin û malên ku kiribûn tev li dikanên girtî di stûyê wan de man.

Sosreta dawî daxuyaniya Dawudê kurê Çawîş a der barê derziyên koronayê de bû. Li gorî kurê Çawîş divê beriya her kesî rêber û kesên têkiliya wan bi karê geşt û gerê re heye werin derzîkirin. Çima? Ji bo ger û geştê vî welatî zîrarê nebûne û turist bi ser wan de werin. Îca çi bi millet tê bila were. Derzî li kê ketiye li kê neketiye ne xema wan e. Rojê çend kes dimirin ne xem e; ya girîng bila turist ji vî welatî kêman nebin.

Tîrsa min ew e ku ew bi van gavên xwe yên sosret rewşa vî welatî jî bikin wekî ya Hindistanê ku hejmara kesên bi koronayê ketine 21 milyonî derbas kiriye. Xwedê stara xwe li we bike û we ji qeda û belayên ku haya we jê heye û jê tune ye jî bistirîne.

Sosreteke din jî ji aliya qeyûmê şaredariya bajarê mezin ê Amedê ve hat serê me. Wî jî li şûna kil bike kor kiriye. Qeyûm li Amedê qaşo ji bo sembolên Amedê hin peyker dane çêkirin. Şêranî û zebeşê Amedê derxistine pêş. Peykerê mirovê ku qaşo reklama şêraniya Amedê dike ewqasî bê teşe hatiye çêkirin ku dilê mirov ne tenê ji şêraniyê lê ji dinyayê jî dixelîne. Her wiha zarokek di nava zebeşê Amedê de çêkirine ku mirov çav lê dikeve zombî tê bîra mirov, yanî ku mirov ji qestî hewl bide rûyê zarokê xira bike anca mirov dê bikaribe wiha xirab çêbike. Lê welhasilî di encama bertek û nerazîbûna gelê Amedê de qeyûm neçar ma ku wan herdu peykerên sosret hilîne. Lewre jî di her warî de divê gelê me bertekên wiha nîşan bide ku bizanibin dew birayê mast e.



Tiştanok (mamik)

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine . Bi hêvî me ku bi dilê we be. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe re tiştên li ba xwe binvîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.

1-Tiştêk min heye
Çix belanokê
Bazda pêşiya bûkê
De bêjin ew çi ye?"

2-Tiştêk min heye

Ço kero
Hefsar zero
Li dû min wero


3-Tiştêk heye
Li çolê şîne
Li sûkê reş e
Li malê sor e

çavkanî: Mamikên Botanê
berhevkar: Rênas Xendekî
û Dildar Botî

Bersivên me ev in:

3-Çayê
2- Banger, Gundor
1-Fîşek, gule

XAÇEPIRS



JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

- 3. Zemîn 5. Cînavkekî pir hejmar 7. Darvekirin 8. paşdaçekek
- 9. Loma, ji ber ku 13. Alava ku dew tê de tê kilan 14. Arvan, genimê hêrayî
- 16. Rengekî tarî 19. Nazik 20. Reşaya mirov ya ku li ber tav û ronahiyê çêdibe
- 21. Bizina bê kuloç 22. Vexwarina serke ya zarokan
- 25. Notayeke muzîkê 26. Kesên ku guh dide keriye pez û diçêrîne
- 28. Sîle, lêdana li rûyê mirov

JI JOR BER BI JÊR

- 1. Herêmeke Kurdistanê ya di navbera başûr û rojhilatê Kurdistanê de
- 2. Meheke biharê
- 3. Cînavkekî pirhejmar
- 4. Ol
- 6. Dibe ku, belbî
- 10. Cih, mesken
- 11. Bajarekî rojavayê Kurdistanê..
- 12. Çewt, ne rast
- 15. Xerîbî
- 17. Çavkaniya ku av jê diherike
- 18. Têkoşîn, serhildan
- 20. Reqs
- 23. Alaveke şer ya kevnar
- 24. Jin ji bo xeml û xêza xwe li çavên xwe didin
- 27. Tûj

Bersiva hefteya borî



Dengê zarava û wêjeya kurdî li Ewropayê

Navenda Nûçeyan

Kitêbhên pirtûkfiroşek e ku li Alman-yayê ye û pirtûkên kurdî digihîne hemû deverên Ewropayê. Me li ser serborî, kar û xebatên Kitêbhênê bi xwedi-yê wê Kawa Goreşî re xeber da. Kerem bikin em guh bidin Goreşî

Pirtûkfiroşê ewil li Almanyayê

Kitêbhên projeya ewil e ku li Alman-yayê û Ewropayê pirtûkên kurdî dide nasandin û belavkirin. Kawa Goreşî diyar dike ku berî du salan wî û hevala wî ya îtalyayî Sarayê ku di heman demê de lêkolîner e, Kitêbhên dameziran-dine. Jî bo armanca Kitêbhênê Goreşî wiha dibêje: “ Rojnameger, xwendekar û lêkolînerên kurd yên ku li Ewropayê bûn, zû bi zû nikaribûn xwe bigihînin berhemên bi kurdî çap dibûn. Li bakurê Kurdistanê hin dezgehan xebatên baş dikirin di vî warî de, lê belê wan jî tenê pirtûkên kurmancî digihand Ewropayê. Lê di zaravayên dîtir de berhem tune bûn. Li Swêdê, li cem hin weşanxane-yan, di hin refên piçûk de berhemên bi kurdî hebûn lê ev yek sîordarkirî bû. Wan nikaribû ji Swêdê pirtûkan bigihî-nin welatekî dîtir yê Ewropayê.”

Kitêbhên bi piştgiriya navenda çap û belavkirinê ya Xezelnûs û xwedi-yê wê Rewas Heme Salih pirtûkên soranî digihîne Ewropayê. Goreşî dibêje ku wan di serî de pêwendî bi hemû rêxis-tin û dezgehên kurdan re daniye da ku kare xwe berfirehtir bikin û xwe bigihî-nin hemû kurdên li diyasporayê. Ji bo vê pêvajoyê Goreşî wiha didomîne: “Bi rêya pêwendiyên me hinek hevalan gotin ku li Almanyayê navendeke bi navê Zozan heye û pirtûkên kurdî lê hene. Hevalan gotin heke hûn biçin xeber bidin dê alîkariya we bikin. Der-dora 7 hezar pirtûkên kurdî, tirkî, al-manî, îngilizî yên li ser pirsra kurd hebûn. Navenda Zozanê derdora 6 hezar pirtûkên kurmancî dan me. Bi vî awayî me dest bi karê xwe kir.”

Gencîneya pirtûkên zarokan

Kitêbhên bêhtir bala xwe dide ser pirtûkên zarokan û dixwaze di vî warî de bibe gencîneyek. Goreşî girêdayî vê yekê behsa bîranîneke xwe dike û wiha pê de diçe: “Ez li Almanyayê di pirtûk-xaneya dibistaneke zarokan de de di-xebitîm. Min di vê pirtûkxaneyê de kar dikir. Gelek zarokên penaberan dihatin vê dibistanê. Beşa Çand û Kulturê ya dewleta Almanyayê dixwest ku pirtû-

kên kurdî ji bo zarokan bikire. Ev ji bo hemû zimanan derbasdar bû helbet. Ji bo kurmancî hinek derfet hebûn lê ji bo soranî tu derfet tune bûn. Ji bo min ev pirsgirêk û xaleke pir girîng bû û me jî hewl da em di serî de pirtûkên zaro-kan bigihînin Ewropayê. Armanca me ew bû ku em xwe bigihînin malbatên penaber yên kurd da ku ew li diyaspo-rayê jî bikaribin zimanê kurdî fêrî zaro-kên xwe bikin.”

Navendeke pirzaravayî ye

Kawa Goreşî bi xwe soran e lê belê haya wî ji kurmancîaxêvan û ji edebi-yata kurmancî jî heye. Kitêbhên jî na-vendeke pirzaravayî ye û ev yek wê di vê biwarê de dike navendeke yekta. Go-reşî ji bo vê taybetiya Kitêbhênê dibêje ku zaravayên sereke û berfireh kur-mancî û soranî ye û wiha berdewam dike: “Di beşeke piçûk de me cih daye pirtûkên bi kirmanckî (zazakî) jî û di be-şekî jê piçûktir de jî hinek pirtûkên bi za-ravayên din hatine nivîsin hene. Beşek bi tirkî jî heye ku ew jî bi piranî li ser pirsra kurd e. Bi zimanê almanî û îngilizî jî berhemên ser pirsra kurd hene. Di si-berojê de em ê beşa zaravayên hew-ramî, kelhûrî (kurdiya xwarê) û zazakî xurttir bikin.”

Kurd ji pirtûkan bêpar in

Bê guman meroqek e mirov dix-waze hîn bibe ka li Ewropayê xwînerên kurd di çi rewşî de ne, kirîn û firotina berhemên kurdî di çi astî de ye? Ev pirs û bersivên girîng in. Goreşî li ser van pirsan wiha kûr dibe: “Li ber destê me tu dane tune ne, em nikarin bi rêjeyan vê yekê destnîşan bikin. Lê li Alman-yayê kurd kêmnîeyeke pir mezin in. Ev kêmnîe bi piranî ji bakurê Kurdistanê ye, lê ji beşên din ê Kurdistanê jî hene. Li Almanyayê ji bo zarokên neteweyên din yên kêmnîe pirtûkxaneyên pispor hene û di gelek dibistanên Almanyayê de derfetên wan hene ku xwe bigihînin pirtûkên bi zimanê xwe. Lê ji bo ku kurd wekî çavkanî bi kar bînin, lêkolî-nan li ser bikin pirtûkên kurdî tune ne, pirtûkxaneyeke ku pisporane kar bike tune ye. Tenê li çend navendên Al-manyayê arşivên pirtûkên kurdî hene. Lê mirov nikare ji wan navendan zêde sûd werbigire.”

Ji bo soranî destpêkek e

Ev du meh in Kitêbhên bi awayekî çalak dest bi xebatên xwe yên firotin û belavkariyê kiriye. Goreşî dibêje ku di van her du mehan de herî zêde pirtû-



kên soranî hatine firotin. Goreşî se-demê vê wiha destnîşan dike: “Cara ewil e ku pirtûken soranî li Ewropayê tîn belavkirin. Ji ber vê yekê jê tîbû-nek li beramberî berhemên soranî heye. Bi taybetî xelkê rojhilatê Kurdis-tanê li diyasporayê bêhtir pirtûkan dis-tînin. Ji ber ku li rojhilatê Kurdistanê rewşa zimanê kurdî nebaş e û pêrgî astengiyan tê, ciwanên kurd nikarin li wir bixwînin. Ji ber vê yeke jî li diyas-porayê bêhtir bala wan û hezkirina wan li ser kurdî ye. Pişt re pirtûkên li ser fêkirina ziman û ferheng herî zede hatin firotin. Ev cure berhem bala xwendevanan dikişînin.”

Astengî bi têra xwe hene

Li derveyî welêt dabînkirina pirtû-kên kurdî zehmet e û heta niha gelek kurd aciziya xwe tînin ziman ku li diyas-porayê nikarin xwe bigihînin berhemên kurdî. Kurdên ku li welat dijîn jî nikarin xwe zû bi zû bigihînin berhemên kurdî yên ku li derveyî welat hatine çapkirin. Goreşî behsa pirsgirêkên peyda kirina berhemên kurdî dike û wiha dibêje: “Di karê pirtûkfiroşiyê de em rastî gelek as-tengî û kêşeyan hatin. Lê kêşeyeke me ya sereke ew bû; me nekarî em li Ber-lînê ji xwe re cihekî bi hêsanî peyda bikin û pirtûkên xwe lê bi cih bikin. Kê-şeyeke din jî ew bû ku pirtûk bi hêsanî ji başûr û rojhilatê Kurdistanê nagihêjin Ewropayê. Nexasim ji bo rojhilat pirs-girêk zêdetir bûn. Dema em ji rojhilat pir-tûkan dixwazin pêşî pirtûk ji rojhilat

diçin başûrê Kurdistanê dû re ji wir tîn Ewropayê. Her wiha piraniya xwende-karên kurd nikarin pirtûkên bi kurdî bix-wînin ev jî pirsgirêkeke din e.”

Li ser pirtûkxaneya xwe jî Goreşî wiha dibêje: “Piştî ku me van pirtûkên li ber destê xwe qedandin em dixwazin, ji ser belavkarên pirtûkên kurdî yên li Kurdistanê pirtûkên kurmancî û kir-manckî dabîn bikin. Niha ji gelek çapxa-neyên wekî Perî, Avesta, Peywend, Sîtav, Lîs, Nûbiharê û hwd. Berhemên kurdî li ber destên me hene.”

Divê bi zimanê xwe xeyalan bikin

Kitêbhên proje û fikreke hewce ye ji bo kurdî. Kitêbhên dengê zarava û wê-jeya kurdî ya li diyasporayê ye. Di demên pêş de em ê bêhtir vî dengî bi-bihîzin. Digel hemû zehmetî û kêşeyên heyî Kitêbhên bi eşq û vîneke zexm li ser karê xwe berdewam dike. Kawa Go-reşî di dawiya axaftina xwe de hin pêş-nîyazên xwe li xwendevanên kurd, dayik û bavên kurd dike û hinek mizgî-niyan jî bi me re parve dike. Wekî pêş-niyaz Goreşî van tiştan dibêje: “Divê kurd piştgiriya kurdî, piştgiriya pirtûkên kurdî, çand û siyaseta kurdî bikin. Heke zarokê, mirovek, gelek bi zimanê xwe xeyalan bike, bi zimanê xwe bijî û biafi-rîne ev baştir e ku ew xwe bi zimanekî din îfade bikin. Ev babet girîng e û divê dayik û bavên li diyasporayê bêhtir bala xwe bidin ziman û zaravayên xwe da ku zarokên wan jî bikaribin bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivin û bixwînin. Ji bo vê

yekê jî divê siyaseta kurd û çalakvanên kurd yên li derveyî welêt bêhtir li ser daxwaza ziman bisekinin û di meseleya bidestxistina pirtûkên kurdî de bi israr bibin. Divê xwe birêxistin bikin û bi rêya komeleyan ev pirsgirêka pirtûkên kurdî bê çareserkin. Her wiha pêwîst e ku pirtûkhezên ewropî, pirtûkhezên kurd ên li Ewropayê û projeyên wekî Kitêb-hên jî bi rêya festîvalan (Festîvala Fîk-mên kurdî li Berlînê) komeleyeke alîkariyê çêbikin. Di demên bê de bi saya sere van komeleyan mirov dikare pêşangehên berfirehtir yên çanda kurdî li Ewropa û Almanyayê li dar bixe. Her wiha mirov dikare pêşangeheke mezin a pirtûkên kurdî jî li Almanyayê çêbike.”

Mizgîniya xebatên nû jî hene

Goreşî gotina xwe bi çend xeberên xweş wiha bi dawî dike: “Armanca me ya sereke û hêviya me ew e ku Kitêb-hên siberojê li Ewropa û Almanyayê xe-batên xwe mezintir bike; da ku bikaribe bibe navendeke girîng ya çap û belavki-rina berhemên kurdî. Her wiha em dix-wazin digel pirtûkên kurdî cih bidin berhemên hunerî yên wekî tablo û xeml û xêzên kurdî jî. Projeyeke din a Kitêbhênê jî heye. Ev jî Kitêbxwên e. Kitêbxwên podcastek e; niha li ser Clubhouse em carinan hinek pirtûkên bi soranî û kurmancî bi hin nivîskaran re dinirxînin û didin nasandin. Hêviya me ew e ku em van qeydan ji ser pod-castekê bi xwînerên kurd re parve bikin û vê xebata xwe berfirehtir bikin.”



Pirtûkxaneya Serdem

Pirtûkxaneya Serdemê di 22'ê îlona 2018'an de bi pêşengiya Yekitiya Rew-şenbîran a Herêma Efrîn- Bakur û Rojhi-latê Sûriyeyê hat vekirin. Yekem pirtûkxane ye li warên koçberiyê bi tay-betî li kampa Serdemê hatiye vekirin. Di pirtûkxaneya Serdem de nêzî sê hezar cureyên pirtûkan hene; tê de pirtûkên wekî roman, çîrok, wêje û helbestên bi zimanê kurdî, erebî û tirkî hene. Pira-niya pirtûkan di nav malên hilweşiyayî de di dema şer de hatine dîtîn û xistine pirtûkxaneyê.

Hevseroka Yekitiya Rewşenbîran a Herêma Efrînê Avesta Ibrahîm der barê armanca pirtûkxaneyê de axivî û diyar kir ku pirtûkxane ji bo koçberên ku ji axa

xwe dûr ketine hatiye vekirin û wiha got: “Me xwest bi rêya vê pirtûkxaneyê xwe bigihînin civakê û ciwanan, ji wan re bibin alîkar. Gelek pirtûk me ji nav malên hilweşiyayî û rûxandî derxistin û anîn pir-tûkxaneyê. Rojên destpêkê ji vekirina pir-tûkxaneyê em ditirsiyan ku koçber vê yekê qebûl nekin lê bi demê re xwestek û qebûlkirina gel ji xwendinê re zêdetir bû. Piraniya ciwanan berê xwe dan pir-tûkxaneyê û ji derveyî kampê jî ciwan derbasî pirtûkxaneyê dibin. Di vê pirtûk-xaneyê de pirtûkên lêkolînê jî hene, mirov dikare agahiyên xwe bi rêya wan berfirehtir bike. Ciwan û zarokan zêdetirî du hezar pirtûkan girtine ji xwe re dixwî-nin û li ser nîqaşên xwe dikin.”

Avestayê behsa berhemên ku ji pir-tûkxaneya Serdem derxistine kir û wiha pê de çû: “Em bi rêya vê pirtûkxaneyê pêşbirkên wêjeyî salane li dar dixin, di heman demê de dewreyên perwerde-yên lêkolînan jî tîn vekirin. Gelek ciwan li gel me hene xwedî meraq in û dikarin berhemên xwe di pêşerojê de derxin. Ji zarokan re jî di dibistana kampa Ser-demê de odeya xwendinê me ava kir û pirtûkên çîrokên zarokan tê de hene. Em bi hêvî ne ku di demên pêş de li tevahiya dibistanan odeyên xwendinê ji şagirtan re bên vekirin, da ku bêhtir fêrî zimanê xwe bibin. Pirtûk hevalên mirovan in. Em bi hêvî ne mirovên zana ji vê pirtûkxa-neyê derbikevin.” **ŞEHBA**

Dengê Museyîb dengekî ebedî û herheyî ye

Yaqûb Kurmanc

Museyîb Gulşenzade di 22'yê Kanûna sala 1961'ê li gundê Gula Morsê ser bi bajarê Makûyê hatiye dinyayê. Navê dayika wî Gozel e û navê bavê wî jî Ferzende ye û ji êla Celalî û bera Qendikan e.

Dengbêj Museyîb ji temenê xwe yê zaroktiyê eleqedarî kilam û stranên dengbêjan dibe û dema şeş salî bûye her dem li ber radyoyê rûdinişt û bi baldarî guhdariya kilam û stranên dengbêjiyê ya Radyoya Rewanê dikir û dema bernameya Rewanê bi dawî dihat wî ew kilam û stranên ku ji radyoyê hîn dibû bi tenê cihekî rûdinişt û wekî dengbêjên radyoyê kilam digotin û bi xwe bawer bû ku ew jî dê rojekê bibe dengbêjekî binavûdeng.

Herêma Makûyê jî wekî gelek herêmen din yên Kurdistanê her dem rastî bûyer û serpêhatiyên nexweş yên siyasî, olî û qewmî hatiye û ji ber şer û cengan xelkê wê hatine qetilkirin û sirgûnkirin.

Ji ber ku berê niştecihên herêma xwenda nebûne û qedexeya ku li ser civakê hebûye, ew bûyer û şer bi awayekî nivîskî nehatine qeydkirin û tenê ew bûyer û diroka veşartî di kilam û stranên dengbêjan de zindî mane û sîng bi sîng bi rêya dengbêjan ve hatiye veguhestin. Şerê Tahir Xanê Qelenî li gel Xanê Makûyê, Serhildana Agiriyê û sirgûnkirina Kurdên Makûyê û her wiha serhildana kurdan li herêma Makûyê di destpêka Şoreşa Îslamî ya Îranê de û şerên êl û taîfeyan û bûyerên civakî û malbatî, mirina kesûkaran û kesayetiyekeî navdar hemû û hemû tim bibûye sebebê gelek xemgîni û trajediyan.

Dema li Makûyê kesek dimir Ji bo wî kesê mirî şîn û girî dikirin û jinan di şîne de ser kesê mirî kilamên zelûfî û xemgîn digotin û ew kilam wisa bi rêk û pêk û pisporî ji aliyê jinan ve bi lêv dibûn ku mirov hest dikir ew kilam ji mêj ve hatine nivîsandin û amadekirin û jinan jî ew ezber kirine û di şîne de dilorînin û distirênen. Lê di rastiyê de wan di heman demê de ku beşdarî merasîmê dibûn ew peyv û rist bi şarezayî li hev dianî û digotin.

Yan di demên herî kevn de li herêma jî bo mirî êrdek ango gerdek girêdîdan û gulî û gulik di stûyê hespê de darda dikirin û cilûbergên mirî davêtin ser zîne hespê û dû re dengbêjekî dengzîz û dengxweş gema hespê digirt û ber bi kesên ku beşdarî şîn û teziyê dibûn,diçû û pê re jî kilamên keserkûr digot û gel jî hevdem çokê xwe dixistin û digiriyan.

Serpêhatiyên kurdan bi du sebeban dibûn kilam û stran.

Sebeba ewil ew bû ku qedexetî li ser civaka kurdan hebû û ew zext û zordariya dewletên zordest dibû

Dengbêjê nemir Museyîb Gulşenzade yek ji dengbêjên bi navûdeng yê herêma Makûyê ye, Museyîb hê zarok bûye ji ber ku carekê li dibistanê stran gotiye, mamoste lê daye û wî jî dibistan terk kiriye û denbêjî kiriye

sebeb ku kurd bi rêya denbêjiyê û kilam û stranan ve serpêhatiyên xwe bêtî ku bi awayekî nivîskî qeyd bikin dirok û dema rûdana wê serpêhatiyê diparastin û lê xwedî derdiketin.

Her wiha piraniya civakê nexwenda bûn û nikaribûne serboriyên xwe li ser pelê kaxezan binivîsin û wekî belge bi kar bînin.

Mirov dikare ji aliyê derûnnasî û pîskolojiyê ve jî behsa çanda dengbêjiyê bike. Gava bûyereke nexweş dihat serê kurdan ew bi roj û meh û salan di rewşeke xemgîn û bi êş û jan de dijiyan. Her dem dilê wan tijî kul û êş bû û dilbirîn dibûn û tu carî nikaribûn wê bûyerê ji serê xwe derxin. Lê tişteke dihat hewara wan. Ew jî çanda dengbêjiyê bû; çî xem û kulên wan hebûn wekî kilam û stran digotin û hêsiyê di-barandin û hêdî bi hêdî sivik û aram dibûn û êşa bûyerê di nava kilam û stranên xwe de dihelandin.

Dema berê çanda dengbêjiyê çandeke dewlemend û serdest bû.Radyo û televîzyon û internet tunebû û ji bo ku xelkê demên xwe bi xweşî û şadî derbas bikiribana her şevê li malekê şevbêrk li dar dixistin û tê de dengbêjan çîrok û efsaneyên berê çî di warê evîniyê de û çî jî di warê mêrxasiyê de bibûna dikirin kilam û civat bi vî awayî sergerm û kêfxweş dibûn.

Bê guman kurdên herêma Makûyê jî di her serdemê de gelek bûyer çî xweş û çî jî nexweş tecrûbe kirine û borandine û ev jî bûye hokar ku gelek dengbêj ji vê herêma serî rakin û kilam û stranên wan bûne belgeya herî xurt ji bo naskirina çand û diroka herêma Makûyê.

Dengbêjê nemir Museyîb Gulşenzade di hevpeyvînekê de li gel kanala

Seherê Kurdî de dibêje ku gelek dengbêj ji bo min sembol bûne bi taybetî apê min Silêman û rehmetî Eliyê Kaşoyê Qizbaxşolî ku yek ji dengbêjên navdar yê herêma Makûyê ye û her wiha dengbêjên Radyoya Rewanê jî bandoreke mezin û girîng di warê dengbêjiyê de li ser min danîne. Ez çand û hunera xwe ya dengbêjiyê deyndarê wan im û tu carî keda wan ji bîr nakim. Ew dibêje her kes bi awayekî bûyer û pîrsgirêkên herêma xwe tîne ziman û em jî bi rêya dengbêjiyê vê kedê dikin û gelek baş e ku her kes pîrsgirêka herêma xwe ser veke û bibêje ji ber ku em yekem kes in ku wan pîrsgirêkan hest dikin û dibînin.

Dengbêj Museyîb ji heman temenê xwe yê biçûktiyê dengbêjiyê dike û di şevbêrk û dawetan de dengbêjî dikir û her wiha dema diçû dibistanê jî bo şagirtên dibistanê jî kilam digotin û distira. Kilama ewil ew fêr dibe û dibêje, kilama 'Hêdî bajo, ez birîndar im' ya dengbêj Mihemedê Silo bûye.

Dengbêj Museyîb dibêje, rojekê di dibistanê de şagirt ji min dixwazin ku ez ji bo wan kilamekê bibêjim min jî gotina wan li erdê nexist û min dey lê kir û kilamek ji bo wan got, lê ji ber ku min bi dengekî bilind kilam digot, mamosteyê dibistanê dengê min bihişt û loma bi çîlpî û şivikê li min xist û ew lêdan bû sebeb ku ez xwendin û nivîsandinê biterikînim û êdî neçûm dibistanê. Lê ew ji hedef û armanca xwe dûr nakeve û bi cehd û baldariyeke bêhempa li pey çanda dengbêjiyê diçe û wisa di çanda dengbêjiyê de pêşketî û şareza dibe ku bi xwe jî naveroka kilaman dinivîse û dibêje.

Her wekî hate gotin Dengbêj Museyîb ji bilî gotina kilamên hunermend û dengbêjên navdar, bi xwe jî çend kilam nivîsîne û gotiye. Hinek ji wan ev in:"Yarmiç, Goma Maro, Behra Êrmiyê, Soma Biradost, Ferzende li Adaxanê".

Dengbêj Museyîb Gulşenzade piştî

çend salan ji gundê Gola Morsê mala xwe bar dike û tevî malbata xwe berê xwe dide Êrmiyê û li gundê Şahînavayê nêzîkî riya navbera Êrmiye û Mehabadê niştecih dibe.

Dengbêj Museyîb Gulşenzade li wir jî xebatên xwe di warê dengbêjiyê de ranawestîne û bi qasî ku li gelek festîval û pêşangehên folklorî û çandî de beşdar dibe û di sêyemîn festîvala folklorê kurdî ya sala 2011'an li bajarê Pîranşarê weke baştirîn dengbêj tê hilbijartin û xelatîkirin û her wiha ji ber xebatên wî yê hêja di warê dengbêjiyê de dibe endamê Mala Dengbêjan ya Enstîtûya Ehmedê Xanî ya bajarê Êrmiyê.

Kawîs Mîlanî ku bi xwe jî dengbêjekî giranbiha yê parêzgeha Êrmiyê ye der barê Dengbêj Museyîb de wiha dibêje: "Ew xwediyê hizir û hişmendiyeke bilind bû û loma wî karî di demeke pîr kurt de di rêza dengbêjên giranbiha û rûmetgirên de cih bigire."

Dengbêj Museyîb bi salan ji bo pêşxistina çanda dengbêjiyê kar û xebatên bêhempa kirin. Heta nebûna malê dinyayê û berjewendiyên kesane jî ew ji wê çanda neteweyî dûr nexist û bêhêvî nedibû. Eger astengiyeke di warê huner û muzîkê de pêş de bihata wî hewl dida wê astengiyê li ser rêya huner û muzîkê rake û her dem destgir û alîkar bû.

Piştî ewqas sal xizmetkarî di warê dengbêjiyê de mixabin Dengbêj Museyîb tûşî nexweşiyeke bêderman dibe û ev dengbêjê navdar sala 2019'an ji ber wê nexweşiyeke koça dawî dike û wî li goristana Îslamabadê a Êrmiyê dispêrin axê.

Dengbêj Museyîb Gulşenzade xwediyê 5 zarokan e ku piraniya wan di warê huner û muzîka kurdî de çalak in û rêya pîroz ya bavê xwe dişopînin.

Dengê Museyîb Gulşenzade dengekî ebedî û herheyî ye û dê her dem di bîr û ramanên gel û miletê xwe de zindî bimîne.

Kîn û nefret

Newaf Mîro

Cihê kîn û nefret lê rewşa be, heta serdest û serbest be, ew civak û dewlet, weke bombe-yeke atomî ye, ew dikare tim biteqe. Helbet gava biteqe, ne ji yek alî kuştin û qirkirin çêdibe, ji her alî dibe. Em gelek carî tenê ziyanên canî, dibînin û dihesibînin.

Lê ev ji wê bêhtir e. Kîn û nefret mirov û mileta dikare bike robotê kuştinê. Têvî ku em îro dibînin, robot, çek û her cûre amûrên kuştinê hene, helbet ew me ji bo jiyanê, ji bo kuştinê ne. Yê vê diafirîne, bikartînin dîsa mirov in. Ew hêrs û kîna mirov, hest, hezkirin û hisa êşê dike, berevajî ew kêfê ji kuştinê, êşê û ezab distînin. Ew kîn û nefret mirov dike sadîst. Mirovên serdest, ev kîn û nefret ji bo xwe bikaranîne û hê jî tînin.

Karê bi rikabetê pêk naynin, bi nefretê pêk tînin. Ew kirine weke çekê, û her carê li dijî hin alî, netew û ola bikartînin. Ne tenê ji bo netew û olên din, di nav xwe de, li dijî jinan û hevzayendan jî bikaranîne. Nefret di makezagonên gelek dewletan de tewankarî ye. Helbet mirov di xweza xwe de fenek û keyskar e. Gava zagon û civak, berjewendiyên civakê yê, ewlehî, aborî, etîk û exlaqî rê û derfetê bidin mirova, ew bi çeka nefretê carê beşekê dide ber tîrên xwe. Di destpêkê de "dijber û dijminê" xwe bi demê re yê nava xwe pûç dike. Ez nabêjim; ola, lê hêzên olî, netewperest, û siyasî ev nefret kirine nan, av, çek, huner, ticaret û pere û bi her cûreyî bikaranîne.

Ne tenê serdesta, bindesta jî, li dijî hêza serdest, nefreta xwe parastinê û têkbirina nefreta serdest vehemandine. Ew di hêla, ku mirov çalak bibin, li dijî hêz û nefretê. Ji bo pûçkirina, nefreta bindest, peyv û têgeheke di nav bindestandê tê bikaranîn, ku kujer û kuştî "bira" ne. Ev dike ku hêza serdest, xurt bibe û şaşî di kuştî û mexdûr de bête dîtin. Helbet mirova hêza nefretê, li dijî nefretê bikaranî ba, dê aşî û azadî ne di kuştinê, şer û tunekirinê de bihata dîtin.

Nîkola Tesla dibêje: "Ger meriv karîbûya, kîn û nefreta mirovan, veguherta elektrîkê, dê dinya gişk pê ronî biba." Helbet ger mirova li şûna nefret, kuştinê û şerê serê xwe bi afirandinên nû yê ku xizmeta mirovahiyê, lawir û siruştê re biêşanda dê rewşa mirovan cûda ba. Weke ku Nîkola Tesla kiriye, derdora 120 patentên wî hene û afirandinên wî, hê jî kêrî jiyanê tîne, lê gava mir deyndar bû. Ew dibêje; "min bi perê patenta patent/îcadên nû diafirîndin".

Helbet hêz, têgeh û siyaseta me jî bi qasî şer, nefret û kîna hev dikin, bi hêz, hizir û dewletên li ser nefret û tunebûna wan, xwe saz, dê rewşa me cudatir ba ji îro.

